*Dîwana Mela Nûriyê Hesarî* (1934 – 2011)

Dîwana

# Mela Nûriyê Hesarî

(1934 – 2011)

**3**

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ne**

Navê pirtûkê:

**Dîwana Mela Nûriyê Hesarî (3)**

(1934 – 2011)

Pêşgotin:

**Dilawerê Zengî**

Tîprêzî:

**Gulistan Emîn**

Bergsazî û rûpelsazî:

**Şengo Dumilî**

Çapa yekem

**2724k - 2024z**


Qamişlo- Roavayê Kurdistanê

Çapxane:

**Mîran**

Qeware: 14c.m X 20c.m

Jimara rûpelan: 274



**Helbestvan Mela Nûriyê Hesarî** (1934 – 2011)

# Pêrist

Pêşgotin .......................................................... 11

Xweşiya bin destê neyar ......................................23

Divê şêx û oldar di gel Kurdan rabin .......................32

Divê Kurd li dema nû meyzênin .............................40

Islam a Xwedê ye ne ya koledar e ..........................45

Divê mirov xwe jibîr neke .....................................49

Axaftina di gel çemê Dicle ....................................70

Ev dem ne dema ku Kurd avaniya çêkin ................82

Çima Kurd neçûn asîman ......................................88

Hey mirov ka bike hîndiş ......................................92

Welatê Kurd difra cîhan û Asya ye .........................97

Welatê Kurdan bi nav û deng e ...........................101

Li ser alaya Kurdistanê ........................................110

Welatê ezbenî welatê Kurd e ...............................112

Hey welat ...........................................................114

Em Kurdistanê dixwazin .......................................118

Derdê Kurdistanê giran e ....................................121
Mizgîna welat ....................................................126
Hey gelê Kurdê li Sûrî ..........................................129
Bajarê (Şeqlawe) ................................................133
Civîna gundê Cirmiz .............................................138
Dostê rast kes nîne .............................................143
Be'sî ji bo 'ereb nebaş e .......................................148
Em çilo çêbûn! ...................................................163
Bîreweriya min ...................................................168
Cîhan bêkêr e.....................................................180
Siwarê Kurdan hatin şer ........................................184
Kurd ji cengê natirsin ..........................................185
Kurdên bi kolos ketine cengê ..................................190
Partiya Kurdê Sûriyê ...........................................192
Kurd ji pêşî de qehreman e ....................................195
Divê Kurd hemû cengê bikin ..................................199
Kurd bûne wek şêrê birîndar ..................................201
Divê Kurd guhdar bin ...........................................205
Çavên welat li pêşmerge ye ...................................207

Kurd hilkişîne ser çiya .........................................209
Li cenga Zaxo binerin ..........................................211
Cenga Kurdê Îraqê ...............................................214
Kurdê mêr kêla neyar e .......................................218
Hestiraneke evînî ................................................221
Hawê bêlûtê û cengê ..........................................225
Hestiraneke cengî û şerê çiyayê Kurdistanê .........229
Hey xortê pêşmerge ............................................236
Sirûda Batmanê ....................................................238
Gundê Nûrşîn li Serhedê .....................................242
Lerzek li nav Kurdan ...........................................250
Şehrê Bîngol hejiya .............................................254
lerzîna Licê sala heftê û pênc di roja Şemî de ......261
Buhiştek bû dojeh (Min Buhiştek dî) ...................269

## Pêşgotin

Kurd jî wek gelên din xwedî wêjeyeke cihêreng in. Wêje ne tenê bûye sedema şiyarbûna hestên wan ên neteweperestî, lê heta guhertina ramana wan jî. Di destpêka sedsala borî de, wêje rasterast beşdarî şiyarbûna hestên neteweyî di nav Kurdan de bû, ji ber ku di rûpelên xwe de, tovê berxwedanê yê li dijî rejîmên dagirker hilgirtibû. Şoreşên Kurdî li dûvikhatî, bi taybetî piştî şoreşa Ubeydullahê Nehrî, ku têgihên kûrahiya neteweyî xurt kirin. Rastiya ku ev wêje ji kûrahiya dîrokê derketiye, û ev têgih piştî vedîtinên şûnwarî yên ku hebûna Kurdan a li ser vê xakê piştrast dikin, çêbûne.

Ji vir rola wêjeyê pêwîst û diyar bû. Herweha, di çanda wan a rojane de, ji rola raman û siyasetê nekêmtir bû. Ji her nivîskarekî re bûye handan û dilxwaziyek ku bi riya derbirîn û belavkirina

nirxên sinçî yên civakê, bi pirsgirêkên neteweya xwe ve girêdayî be.

Wêje di jiyana Kurdan de, di bicihkirina helwestên mirovî de, û herwiha rola kirdarî ya tomarkirin û şopandina pêşketina civaka wan de rabûye. Ji vî alî ve wêjeya ku bi rastî û dilsozî pêgîrê pirsgirêkên civakê ye, girîngiyek mezin e, û di bicihkirina hestên neteweperestiyê de, xwedî rolek bi bandor e.

Wêje bi qasî ku ji zordaran, gotinên siyasetmedaran û bawerhişkiya partiyan rizgar dibe, ewqas jî destanên lehengiyê di dîroka gelan de tomar dike. Ji ber ku ew wêje ye, ew, berî her tiştî, li ser hest û wijdanê girseyî radiweste.

Di vî warî de, em ramanwer û helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî 1650/1707 bibîr tînin, ku bi dastana xwe (Mem û Zîn) de bingehê ramana neteweyî ya Kurdan danî, û bang li Kurdan kir ku rêzê li hev bikin. Bi gazîkirina mîrên Kurdan, li şûna parçebûn û şerkirinê, bibin yek. Herwiha, diyar kir ku Osmanî û Faris dewletên dagirker in, Şer û cengên wan li ser xaka Kurdistanê ne, û me jî ji bo şerên xwe bikar tînin. Her ku dem pêşve diçe, rola

helbestvan û nivîskaran pirtir zelal dibe, nemaze em di şiyarbûna hestên neteweyî de wan xwedan roleke sereke dibînin.

Di nav nivîskarên wêjeya Kurdî de, Mela Nûriyê Hesarî cihekî pir giring digire. Di nava Kurdan de, ew bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Di berhem û nivîsandinên xwe de, ew nivîskarekî pir rengareng bû; berhemên wî di warê ziman, ferheng, helbest, çîrok û wergerandinê de hene.

Mela Nûrî gelek berhem afirandin. Ji berhemên wî yên çapkirî:

-Şoreşa Barzanî (Helbest- 1995).

-Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî (1996).

-Zeviyek Gazîdan (Helbest-2000). Pêşgotina wê Fewaz Ebdê nivîsandiye.

-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî- Rêziman- (1996), ku ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve, li Stockholmê hate çapkirin. Careke din ev pirtûk di sala 2024an de, ji hêla malbatê ve li bajarê Qamişlo hatiye çapkirin.

- Herdû berhemên wî (Zeviyek Gazîdan û Şoreşa Barzanî) û li gel hin helbestên wî yên ku cara yekem tên weşandin, di sala 2023yan de, ji aliyê Tora Medyayî ya Rûdawê, li Hewlêrê - Başûrê Kurdistanê, di nava du bergan de, hatin çapkirin. Pêşgotina wê Besam Mistefa nivîsandiye.

-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), (2024), Qamişlo - Rojavayê Kurdistanê, çapxana Beyan, veguhestina tîpan û pêşgotina wê ji hêla min ve hatiye nivîsandin.

Ev pirtûka di nav destên we de, ji helbestên Mela Nûrî yên ku nehatine çapkirin. Ev destnivîs ji aliyê malbata wî û bi taybetî ji aliyê kurê wî Ebdulwehabê Mela Nûriyê Hesarî gihişt destên min. Li ser daxwaza malbatê min ev pirtûk amade kir, sererast kir û pêşgotin jê re nivîsand. Ez, ji dil û can spasiya malbatê û bi taybetî spasiya kekê Ebdulwehab dikim li ser vê baweriyê.

Naveroka mijarên helbestên wî li ser geşkirina hestê neteweyî, welatparêzî û hezkirina Kurd û Kurdistanê ye, li ser hişyariya civaka Kurdî ne, li ser kêmasî, şaşî û gunehên mirovên oldar, şêx, mela û began e, li ser caş, xwefiroş û xinizan e, li

ser lehengî û qehremaniya pêşmergeyan û li ser pêşewayê azadîxwazê rizgariya Kurdistanê, serdarê mezin Barzaniyê nemir e, li ser bûyerên xakhejî, gilî û gazin, şer û ceng û şîniyê ne.

Wek me got, piraniya mijarên helbestên wî welathezî, evînî, marş, sirûd, şînî û xweşxwan in. Ew helbestvanekî pir bi bûyer, şînî û şahiyên gelê xwe ve girêdayî bû. Helbestvanekî xwedîhuner û bibehre bû. Di hûnandina helbestê de, rewanbêjekî zîrek û desthil bû, helbestên xwe bi zimanekî rewan, qeşeng, nazik, bedew û şayik hûnandine, gotinên biyanî di helbestên wî de pir kêm peyda dibin, wateyên gotin û hevokên wî kûr û şîrîn in.

Mela Nûrî ne tenê helbestvanekî bejinbilind bû, belê zimanzanekî zîrek û pir şareza bû. Bi çend zaravayên Kurdî dizanîbû. Lewra wî çend ferheng û rêziman li şûn xwe hiştin. Ferhenga (Kurdî-Kurdî), ferhenga (Kurdî–Tirkî) û ferhenga (Kurmancî- Zazî).

Sed heyf û mixabin ku para bêtir ji berhemên Mela Nûrî hêj destnivîs in û nehatine çapkirin.

Min baş ew nas dikir û têkiliyên me yên hevaltî, dostanî, wêjeyî û zimanî bi hev re hebûn. Mirovekî bi danûstandin bû. Hevalê hevalê xwe bû. Rastgo û xwedî bawerî bû. Zimanxweş, rûgeş û dêmgirnijî bû. Bi perwer û sinçî bû. Bê paye, nefsbiçûk bû. Xwedî raman û pênûseke azad bû. Bi tenahî û dilsoz bû. Helbestvanekî hestnazik û hestenik bû. Bi hêsanî helbestên xwe dafirandin. Evîndar û dildarê xak, av, ba û xweristiya Kurdistanê bû.

**Kurtejiyana Mela Nûriyê Hesarî:**

Di sala 1934an de, li Hesarê, gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mela Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (Hoz) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî Mela bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe (Xanim) dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mela Hisên xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mela Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê, ew û kekê xwe Mela Nezîr, çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mela Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mela Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji Mela Faîqê kurê Mela Hesen girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mela Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznayê.

Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mela Hemîd xwendiye heta ku “Sadulaha Gewra“ bidawî kiriye.

Di sala 1949an de, birayê wî Mela Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de, vegeriyaye Hesarê, lê Mela Nûrî li Xiznayê maye, îcar li cem Mela Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê, di dehê meha Heyvdarê 1950î de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx Eladînê kurê Şêx Ehmed xwendiye. Mela Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mela Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Ji destpêka sala 1967an ve, Mela Nûrî li bajarê Qamişlo – Rojavayê Kurdistanê dijiya.

Piştî nexweşiyeke dûrûdirêj, di roja 25. 01. 2011an de, Mela Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav

me barkir û li goristana Qidûr Begê hate binaxkirin.

Mela Nûriyê Hesarî çend xelat û rêzname wergirtine, wek:

-Xelata Cegerxwîn a afirandina helbestê (2008)

-Bawernameya rêzgirtinê ji festîvala helbesta Kurdî ya 12an li Sûriyê (2007).

-Rêznameyek ji dîdargeha çand û hunerê û kovara Mewasim (2014).

Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê xelatek bi navê Mela Nûriyê Hesarî da destpêkirin.

**Ji berhemên wî:**

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995

-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî, çapa yekem, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1996

-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî, çapa duyem, Qamişlo, 2024

- Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, 1996

- Rêziman: (Destnivîs).

- Ferhenga Kurdî – Kurdî, (Destnivîs).
- Ferhenga Kurdî – Tirkî, (Destnivîs).
- Ferhenga Kurmancî- Zazî, (Destnivîs).
- Vegerandina li ser Zimanê Erebî (Şarvîn), (Destnivîs). (تأويل اللغة العربية)
- Koledar: Çîrokek Helbestane ye, (Destnivîs).
- Du Mar: Çîrokek Helbestane ye, bi zimanê Erebî ye. (Destnivîs).
- 11 Dîwanên Helbestan, (Destnivîs).
- Bîranîn, ji jiyana wî, (Destnivîs).
-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), Qamişlo, çapa yekem, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapxaneya Beyan, 2024.

**Dilawerê Zengî**
Qamişlo-Roavayê Kurdistanê

01.07.2024

# Dîwana

# Mela Nûriyê Hesarî

(1934 – 2011)

**3**

# Xweşiya bin destê neyar

Dilo tu her birîndar î kul û janê te pir bûne
Ji bo azadiya Kurdan keser tê de çi gur bûne

Xwezî azadiya Kurdan me dîba hê di jînê de
Ji bo ku ez nebam winda di vê nalîn û şînê de

Xwezî nanê me ceh bûna bere hêrtin bi distar ba
Bere pê xwarina min jî girar û nîsk û pincar ba

Bere solê me çarox ba cilê ber ji pîna ba
Siwarê me wekî pêşî li ser kurtanê zîna ba

Bere karker wekî pêşî bi bêr û tevrik û das ba
Kirasê me bi tevnê ba di havînê de em xwas ba

Riyê me tev kelem bûna, bere banê me nizmik ba
Bere karê me serkut ba bere cêza me kizmik ba

Bere êmê me garis ba, bere cotê me du ga ba
Bere qaçê kevnik ba li ser wan tevn û dolaba

Bere mûm rohnika min ba firaxê me biba qafik
Bere doşek ji solih ba ji mû ba şalik û şapik

Bere em wê dema berfê biçûna dar û êzinga
Bere dîsa biba çaxê kevan û sêl û bêjinga

Bere dîsa jinik çêkin heban û meşk û qafûra
Bere her dem nebin vala ji têr û xurcik û tûra

Bere dîsa mewîj û dan bixista çal û 'imbara
Bere karwan wekî pêşî herin ber berxik û kara

Bere ava me şilo ba di nîvê qirş û kevza ba
Bere em xwas û birçî ba di nîvê toz û kevza ba

Bere sabûn wekî pêşî kulav û kîl û hîro ba

Rezê tev beyar bûna seraser mişk û mîro ba

Bere karê jina dîsa qesar û qirş û piştî ba
Bere em bê cih û dewlet heta îro nehiştî ba

Hebûna em wekî pêşî dibin destê beg û axa
Di nav lat û riyê serjor bi çûna qerf û miştaxa

Zilamê me şev û rojê li palûta û suxra ba
Hilanîn û çihîna me bi şal û das û şixra ba

Bere nanê me pato ba tenûra me ji axê ba
Bere savar bi mêkut ba bere pale ji taxê ba

Bere hewşê me hefşî ba bere govik di xoxê ba
Çirikvan hatiba pembo bere bênder li hoxê ba

Werîs û lewleb û sêpî den û zembîl û cewdik ba
Teşî hem şewbek û çekur kevan û merş û konik ba

Bere ev tev wilo bana belê em Kurd bi rûmet ba
Wekî tirk û 'ereb îro di Kurdistanê dewlet ba

Ne wek îro şikestî ba nebê nav û cih û xet ba
Ne bin destê neyar bûna nedûrî hev ne çar qet ba

Zimanê me bi serbestî bihata xwendin û zanîn
Serokê me bi destê me ligor me hatiba danîn

Me derdê xwe ji hevdû re bigota bê çilo çêbû
Me zanîba ciwamêrî ne başî tev ji cem kê bû

Keç û lawê me serbestî biçûna ber tîpistana
Bi şal û şapil û kolos biçûna ber gulistana

Bixwara me berê bax û rez û werz û welatê xwe
Biparazta bi şûrê xwe newal û best û latê xwe

Li çolê xwe me qîr daba sirûd û deng û dîloka

Civatên me li hev rûnin bi kêf û peyv û çîroka

Heçî bimrî bi kêfa xwe minê ew xistiba axê
Xwezî sed car bi wî kurdî ku bighê wê dem û çaxê

Emê serbest biçûna cem lek û hêz û kumendara
Bi destê xwe bikin derman birînê her birîndara

Bikin ava welatê xwe bi zêr û sermiyanê xwe
Nivîsara li çapê xin bi her zar û zimanê xwe

Di nîv fermangehê Kurdan bidin bersiv wekî mêra
Hemî kes wê bi kêfa xwe herî ber mêjgeh û dêra

Rewal û keç bi kêfa xwe bidin hevdû dil û mehrê
Bibin wek hev di Kurdistan kesê gund û kesê şehrê

Bi zarê xwe bipeyivin em di burc û şehneşîna de
Bikin govend û dîlanê di yekşem û di îna de

Di gel her dewletê cîhan bikin tevdêr û bazara
Bixin bin herdû lingê xwe serê zor û sitemkara

Firax û dezgeha çêkin derînin av û petrola
Biçînin bax û guldara li deşt û bergeh û çola

Sîpah û leşkera rakin bikin rêzan û bezrînê
Bilind kin beyreqa rengî wekî beybûn û nesrînê

Li ser jorê çiya deynin seraser top û bazoka
Li rastê dijmina berdin berê topa wekî goka

Firoka riste rist rakin herin ber asîmanê şîn
Bikin xumxum li ser gora Memê Ala Sitî û Zîn

Li ser wan kuştiyê Kurdan bikin ava qubê rengî
Welatê me ji nû hingî li cîhan wê bibî dengî

Heçî wek Ehmedê Xanî emê navê ewan derxin

Heçî ku pê nizanibî emê hûrik ewan berxin

Limêj û rojiyê ez dê bikim hingî bi dilkî xweş
Dilê min wê bibî sade herî jê ew girêka reş

Ji bona hev di wê çaxê emê gelkî dilovan bin
Ne wek îro dibin destan bi jan û êş û kovan bin

Xiramek ez ji azadî bi cîhanê tevî nadim
Dû lingê xwe di agir de bi serbestî ezê radim

Me nedvan ev gelê rengî me nedvan text û qeryole
Bi bindestî çilo rûnim li ser texta wekî tol e

Me nedvan xwarinê nermik me nedvan pencer û mafûr
Me nedvan goşt û peqlawe ne misk û nêrgiz û kafûr

Telefizyon me nedva bo ne guhdarî li ber saza
Ne radyo hem ne sînema dema ku ez nebim aza

Ezê çibkim ji bajara li ber sîka gul û dara
Ezê çibkim ji dîlanê dibin destê sitemkara

Ezê çibkim ji balafir lezok û kêf û govendê
Di bin destê neyara de di zindan û reş û bendê

Gelek tiştê xweşik çêbûn di vî çaxê me yî nû de
Ezê çibkim ji tiştê xweş di ber bêhna gen û gû de

Heger ev der bibî Parîs birêjim ez derav û zêr
Dilê min her bi kêf nabî serê min her dibî serjêr

Tevî ku ez dibindest im bi vî rengî xizan im ez
Ji bona xwarina rojê seraser dilgiran im ez

Li cîhanê mi dojeh dî gerek îdî Bihuştî bim
Di cîhana diwem dîsa ne wek îro biriştî bim

Nekû ez bo xwe azadî dixwazim her ji Yezdan î

Belê bo vî gelê bindest mi ev agir li dil danî

Ji bona me heye hêvî ku azadî ne pir dûr e
Hin û hin ew didî pêtî meger îro hinek hûr e

Bijî ev Mustefa Barzanî ewî danî binek jê re
Heger ev dem nebînî jî dimînî wê dema pey re.

***

## Divê şêx û oldar
## di gel Kurdan rabin

Şêxê di welatê me Kurdan de bibe hişyar
Zendê xwe vemale herdû destan bide ser kar

Ez gorî ewê bejna te yî nazik û narî
Sed carî dikim hêvî ji hata te bizanî

Em Kurd in mirîdê te ne carek tu bipirse
Ka bo çi ye daxwaza me Kurdan ser û girs e

Şêx im hûn çi mêr in bo neyara çilo nerm in
Gava li mirîda tu nepirsî em bi şerm in

Hinkî tu jî meyzê li cîhanê bê çi bûye
Haydar bibe îro bişo sewdan qey li ku ye?!

Taca te ye nîşan bo neyaran tu nezanî

Xapê dijminê Kurd pirî kûr in tu xizanî

Îro tu bênî ku li Kurdan bûye ferman
Paşî tê li Kurdan vegerî tê bibî poşman

Pîsê gelê kurdî ji gelê din pirî kêm in
Ev gel ji terîqa te re tenha tê serê min

Tekya vê terîqa Neqşebendî kê xwedî kir
Xetm û tev tewacih bil ji Kurdan kê bicih kir

Tayîn tevî mêvan ka li cem kê dî xuya bûn
Dîwan feqîxane ka li cem kê wekî wa bûm

Warê me ye dergûşa terîqê we yî pêşî
Şêxê we jî Kurd in ta niha pey hev û rêşî

Şêxê me welatê Kurd ji destê wa ku derbî
Kengî tu bi karê li terîqê nû bi gerbî

Çaxê Kurd nemênin kî ji nû tobê dixwazî
Ger pez yek nemînî ma li ber kê tu bibazî

Sed sûnd bi wê tancê tu bi Kurdan bûyî navdar
Ma kengî neyarê Kurd dihêlin tu bikî kar

Destê Kurd neberde tu li benga xwe bipirs e
Pişta te Xweda ye tu ji cîhanê netirs e

Hey şêx im tu hawîrê welatê xwe bibîne
Bê ka ew misilmanê di vî warî de kî ne

Sûrî bûye Be'sî tu dizanî çi dixwazin
Ew bona hilanîna misilmana dibazin

Ew yar û hevalê Ebû Cehl û gawiran e
Goya ji bo Suryanê reben dost û bira ne

Ixwan li ku rabin ew di rêça Emewî ne

Kengî we dihêlin hûn mirov in Ecemî ne

Necd û tev Hucaz bo we şêxa çi neyar in
Îraq bo kesê Kurd çi hewabî Ijdemar in

Îran ji xwe Şî'î ne riya wan ji we dûr e
Rûsî hûn dizanin li misilmana çi şûr e

Tirkî bûne toranî hemî gawir û pîs in
Kengî ew dihêlin şêx di warê wan bilîs in

Ger tu herî Misrê û Yemenê tê bibî bê gel
Mîna ewê dara ku li çolê bibî bê pel

Kî der ma ji bona te ji Kurdistanê pê ve
Naxwe zû bibêje ejî Kurd im hê ji rê ve

Naxwe ev xebata me ji bona te ye îro
Desta nede dijmin tu ji Kurdê me ye pîro

Bêhtir ji me Kurdan tu divê rabî xebatê
Da textê Terîqê tu bi cihkî li Xelatê

Ger hûn bo Terîqa tevî Kurdan bêne lêdan
Hûnê xweş bizanin ku Terîqê we ji wer man

Da peyda ji Kurdan gil û gazin neyê ser me
Da komê siwara ji me Kurdan bêne ber we

Ger hûn tevî Kurdan nekevin toz û gulistan
Dê navê Terîqa bibî winda ji Kurdistan

Peyde nekin gazin ji me Kurdan ku ji binyat
Textê van Terîqa bê hilanîn bibî berbat

Kurdê me çi bêjin hûn ji wan bawerî nakin
Lê hûn li pey dijmin zû dibazin li ku bakim

Şêxê me ji dijmin tu carî neke bawer

Bona te di paşî tu bizane Kurd e yawer

Ger tu pêş neyara bêjî her dem ez ne pişt im
Dijmin wê bibêjî te bê agir ez dikuştim

Zanin sofî û şêx û mela Kurdê  welat in
Tevdêr û civînê we dibînin ku xebat in

Şêx im tu bizane tu bi Kurdê  xwe teba ye
Çaxê ew nemînin xweş bizane tu nema ye

Dijmin her dixwazî bikî winda te b hesanî
Da vala bihêlî vî welatê hemû kanî

Textê te revandin ma gelo tê li ku rûne?
Koçer çûne zozan tu tenê maye li şûnê

Çem hate şikandin tu li cokê bûye çavnêr
Gernas çûne cengê bo te maye bivir û bêr

Ma qey tu nizanî tevgera we tev bi Kurd e
Ma tê ji Kurdistanê şehê min çi bi Kurd e

Ma qey tu nizanî ev Terîqê ku we danîn
Tevde we ji axa vî welatê me deranîn

Çeştî, Neqşebendî, Qadirî, hem Sehrewerdî
Tevde yê welat in ka te kengî yek li der dî

Şêxê Neqşebenda pêhlewan in ser bixwînin
Nehrî tevî Hîzan tevî Pîran de bibînin

Ger min bê fedîhe zor nedîne ser bilind im
Dînê Xwe de mêr in hem bi zêr û xwedî gund im

Qelsî kedê nakî di melayê xwe ve rabin
Neqşî bê çilo bûn tevde îro wekî wa bin

Tu l' pey nivîsara mi here şêxê dilovan

Berya ku te bigrin bi hesanî bixwî kovan

Îro Kurd xizan in bêxwedî ne tu nebêje
Rojek heye bona me bê cîhan dûv dirêj e

Tiştê ku me gotin pirî kûr in çi dirêj in
Carek li me bigrin bes e îdî hûn bibêjin.

***

# Divê Kurd li dema nû meyzênin

Hey Kurd werin hişyar bibin ka ev dema nû çi dem e
Tiştek niha winda nema hey maleva ma qey nebes
Nûka werî bîra xwe baş vê tariya raser welat
Ka çi ji bo Kurdan heye hey maleva ma qey nebes
Ji pêşî de dibên rovî li şûna şêr dikî gêr e
Di piştî kêr giha hestî çi bşjim bê ked û kêr e
Belê çibkim ji kêra dil ezê bêjim neyar çawa
Li Kurdan çêkirin pîlan bi ol û xap û sed hawa
Neyarê me gelek rabûn belê tev ê bi zorê ne
Hinek çûn û hinek mane li ser kursî bi dorê ne
Ev ê zorê dibê zor im bi serbestî xwe nakî dost
Mirov haya xwe jê tênî heta ku rih digêrî bost
Belê yê ku bi dostanî dikî mala mirov wêran
Ew e yê ku dibin zik de dil û cana dikî dêran
Bi vî rengî 'ereb rabûn li ser Kurdan bi dostanî
Misilmanî kirin perde welat girtin bi hostanî
Li pey rêça Zeradeştî, Muhemmed hate cîhanê

Bi çavên qenciyê nêrî li Kurdistan û Îranê
Belê ku ez ji cem Hêzan ji bo her kes verê bûme
Di hin tişta ji Zeradeşt di hin tişta cihê bûme
Me Kurdan bê şer û kuştin dikir bawer bi ola wî
Me ser danî ji bo Hêzdan li jêrî ling û sola wî
Muhemmed go heçî Muslim wekî pêşî xwedî cî ne
Reş û gewr û gelê cîhan li ba min tev Qureyşî ne
Kesê ku bê Xwedî nîne Muhemmed dijminê wî bû
Kesê ku bê yek e Hêzdan li cem wî ew ji xwer dî bû
Li pey Mûsa li pey Îsa kesê dînê xwe ajotin
Didîtin dost û Hêzdanî li ser wa her nekir gotin
Li yek şarî nekir zorek ji bo dînê misilmanî
Digo ber kes nebî Muslim bi tirs û yan bi dilmanî
Digo yê ku bibî Muslim li wa ber kes nekî zorê
Kesê zorê li wan çêkî di gel wan ez diçim gorê
Kesê dînê Musilmanî bi zor û dar hilanîba
Ewê hingî bi mêranî ji wan haya xwe anîba
Kesê pêşî nehata wî li wî carek nekir dozek
Kesê ev dîn bixwestana ji ber xwe wî dida sozek

Digo ber dîn bi kêfê bi kesê ku bê veger nîne
Riya min ya Buhiştê ye, kul û derd û keser nîne
Li pey wî ev 'ereb rabûn dixwestin dewletê çêkin
Kesê ku bê ne bindest im di cih de em serî jêkin
Serî dan kuştin û zorê nema zanin çibû Îslam
Ji bo ew jî wekî Qeyser di cîhan de bibin endam
Nema kesekî li wa nêrî bi çavên qencî û zanîn
Ewan avêt riya qencî riya zorê ji xwer danîn
Ji nû çavên xwe berdane keç û eywan û bajara
Digotin em serekdar in çiya ev Qeyser û Dara
Nema zanin çi Îsa ye çi Mûsa ye çi Zerdeşt e
Li cem wan kuştina mêra dibû fêf û ger û geşt e
Kesê wek wa nema karî di cengê de bikî zorê
Di ber zêr û gulîsora 'ereb tevde kirin gorî
Belê keskî wekî wa xwe nema berda bi cenga ve
Ji bo herdû nebin winda diberda wa bi dev wa ve
Ciwanmêra didîn go ev 'ereb tevde wekî hov in
Ji wan re xwe kirin serbest dizanin ew tov in
Di Îran û di Şamê de li ser texta dirûniştin

Ji Kurd û firs û bindesta bi kêfa xwe mirov kuştin

Nema karîn bi Îslamê bikin ferman nema çêbû

Ewan dînek ji nû çêkir ji deh para hinek jê bû

Ji pêxember qiran çêbûn 'ereb nû bûn wekî Qeyser

Neyarî dane pêxember nema zanin Elî-Heyder

Belê Kurdan diber wan de ji can û dil kirin arî

Di piştî kuştin û zorê di gel wan pir kirin yarî

Dilê Kurdan ji wa nedma li pêxember kirin xatir

Hin û hin Kurd kirin winda heta ku em kirin paxir

Sedê salan bihûrtin em di vî karî de winda ne

Li vê navê bi nalîn in wekî tûtak û kunda ne

Dixwim sondê bi Qur'anê Muhemmed dijminê wa ye

Gelê kurdî tenê zanin di îro de li pey ma ye

Li ser zarê (Ebû Qasim) çi tiştê ev 'ereb bêjin

Li alî kêmiya Kurdan hemû bextê xwe tavêjin

'Ereb rabûn ji bo Îslam nekû rabin bibin Qeyser

Nekû Kurdan ji Kurdistan bi navê dîn werînin der

Nebêjin em ji Hêzdan in, ne jî bêjin kurê wî ne

Nekû zarê me winda kin, ne rûsîtî bikin dîn e

Nebêjin em Mesîhî ne, nebêjin em ji Aşûr in
Nebêjin em kurê Sam in, ji Îslamê gelek dûr in
Nekû kebê bikin dosta Kirimlin bingeha Lînîn
Nekû dînê Musilmana bikin destê zilamê Çîn
Niha em hew didin pey wan emê dînê xwe ava kin
Emê bûka xwe bighêzin, emê lawê xwe zava kin
Ji Kurdan qehreman rabûn, emê êdî li pey wa bin
Wekî şêrê li Barzanê  bere, em Kurd bi wî şa bin
Me naskirne riyê qencî me xapê dijmina dîtin
Me zanî ev gelê kurdî kurê Sûbar û hem Sît in
Bijî her Mustefa Barzan ewî şewqa xwe da cana
Ji ber çavan birin tarî dibêjin em ji bo vana
Bijî ev Kurd û Kurdistan heta roja bimînim sax
Ezê bêjim sirûdê wî ji bo dil jê bidêrî dax.

***

# Islam a Xwedê ye
# ne ya koledar e

Islam bo me Kurdan rêz û ol e hey birader
Hê Kurd bi Zeradeşt bi vê olê kire bawer

Em Kurd ji kevin de berî Îslam bi limêj in
Çaxê me di ola pirî kevin in çi dirêj in

Ev der cih û warê kesê qenc e ji berê de
Her kes jî bela bû tenê em Kurd mane tê de

Nîşaneke qenc e ku cihê Nûh li welat e
Cûdî ji kevin de, di dîloka bi dewat e

Cûdî bi xwe Kurd e di rabûrê de xuya ye
Gohê neyî Cûdî cihê Nûh e çi biha ye

Pêxember û serwer tev ji Nûh in tu dizanî

Difra me bi Nûh e me bi Cûdî xwe deranî

Ola me ye Îslam bi Muhemmed em teba ne
Berya gelê Îslam em bi ola xwe gihane

Islam ji Xweda ye ne ji destê koledar e
Bawer bi dila ye, ne bi pênûs û dev û zar e

Em Kurd pir bi rastî di riya Wî de dibûrîn
Lewra Teter û Rûm em jimartin ji kesê dîn

Textê me sitandin bûne serdar bi vî olî
Em hatin girêdan vî neyarî li me kolî

Tirk bûne sitemkar û ji holê em kirin der
Destê koledara em firotin bi ser û ber

Ê pir bo xwe hiştin da welatê xwe fireh kin
Her sê koledar in ma bi kî  em dê gilih kin

Deh perçe kirin Kurd bi tevaya ker û pîsa
Hin dane Ferensa yê dî dane Ingilîsa

Van gawirê bê dil bi neyarî em di sot in
Berya ku herin ew pir bi zorê em firot in

Dû dewletê gawir em kirin dest 'erebê har
Barê xwe hilanîn lê di şûnê kirin deh bar

Çaxê em dixwazin wekî wan bibin serbet
Her dem ew dibêjin ku Xweda hûn kirin berdest

Lewa ew dibêjin em misilman û bira ne
Hey wax em çi bêjin bine derdê me giran e

Çaxê em bira ne, ma çima em bê ziman in?
Textê we bilind in ma çima em tev xizan in?

Kî kêmî bira ye? em dizanin em ne dîn in

Ew zarê ku Xwedê dan ew divê wek we bixwînin

Yahûd û Fileh tev me dibînin ker û qeşmer
Ew tevde dibêjin Kurd neyar in wa bikin der

Islam bo me Kurdan tev neyar in ji dil û can
Îdî em nizanin ka çi bêjin gelî cîhan?

Kes yarê me nîne çi misilman û çi gawir
Çavên xwe girêdin xwe tev rakin binê agir

Yan wê me bisojî, yan emê herne wiyalî
Da em tevî mêra xwe bibînin bi hevalî.

***

## Divê mirov xwe jibîr neke

Mirov çi zû dizîvirî
Bêhişî xwe digindirî

Carek heye wek agir e
Bi quretî pir dagir e

Serhişk e rengê hesin e
Dibênî her kes li bin e

Tiştek biçî mijyê ewî
Dibêjî tu pir bedew î

Kî jê re bêjî ev çi ye?!
Ew dijminê canê wî ye

Ger yek bibêjî pîs e ev
Wek agirek wî kirye dev

Nebêje ev dostê min e
Nabê nerîna min kin e

Dibêjî ez bîrewer im
Ji bo xwe ez xweş rêber im

Jibîr dikî tiştê kevin
Îro dibêjî em ev in

Kengî mi ev tişt gotiye
Ev tiştekî pir kotî ye

Te dev davête tiştekî
Divê tu xwe jibîr nekî

Pir sal û dem têve diçûn
Tu bûbû gurkî devbixwîn

Te go çima ev tişt heye

Lê tu îro ew bixwe ye

Her dem te çepkê xwe didan
Bo wan kesê xwedyê rihan

Gote didî yek rihdirêj
Di çav te de ew bû qirêj

Te erq didan ji wê rihê
Ji wan miwê rengê jihê

Geh te digo ev rih çi ye?!
Mirovekî wek nêrî ye

Hinka digo: Ev ciher e
Berdaye wî di ber xwe re

Ji du riha wî zer dibû
Dev û simbêl yekker dibû

Mû xwar dibûn dibûn gijik
Toz lê dibû rengê mijik

Mû hişk dibûn rengê kulav
Ji bo kewan dibûne dav

Te ew didî wek pîrhevok
Wek parsek û jar û gerok

Hinka digo rih melkes e
Hindur bimalî pê bes e

Hinka digo ev bizin e
Her xwarina wî kizin e

Ka çav û bêvil çûne ku
Hew nas dikin wî rû bi rû

Hinka digo ev bêhiş e

Ev çi rih û çi xişxiş e

Hinka digo ev hirî ye
Raserî sîngê danî ye

Hinka digo: Ev bûye hirç
Çima riwê wî bûye pirç

Hinka digo: Heyfa mirov
Rih wan dikî bê nav û hov

Hinka digo: Yê rih bi rişk
Tevde bi mû ye bûye mişk

Çima rihê nakî kinik
Wilo dikî şirş û kulik

Çima rihê naşikinî
Çima hilanakî ji binî

Kê ew didî lê dinerî
Fedî dikir kengî herî

Karê te ev ken pê dikir
Şeva xwe pê bi ken dibir

Van gotina xweş bernede
Îro bixe bîra xwe de

Kî bêjî te lêlê jinê
Te xwe bidî ser kuştinê

Ku deynekî bêfedî ye
Kêmî hezar û sedî ye

Gelo çima dixeyidî?
Dikî ku canê xwe bidî

Dikêşî sê sed hesretî

Yan xwe bikî sê sed qetî

Êrîş dikî rengê gura
Yan wê herî nêv axwira

Da kes nebênî wî kurî
Da fediya xwe bibirî

Tevde ji bo yek gotinê
Laşê wî tê ber sotinê

Dibêjî ez çawa jin im
Tevî ku mêr im libin im

Lê wî çima pirsek nekir
Ji ber xwe ew fedî nebir

Bere bigota keka
Çilo dibim wek pîreka

Wî tiştî bavêjim bi lez

Çima ji qehrê bêne gez

Çaxê bibêjî ev weye

Rengê jina li ser te ye

Tê sûnd bixwî bi derew e

Ê reng e jin ê pîs ew e

Niha çima tu heşkerî

Vê pîsiyê dibî serî

Tu xwe dikî wek pîreka

Goya te bû wek mîreka

Xortê me yê pir vê demê

Gelkî ji xwedyê qelemê

Bê zor û dar û kotekî

Bê ku li wa xin rotekî

Serbest bi kêf û dilxweşî
Danîn li xwe ev rûreşî

Hinka xwe kirne wek hina
Ew xwe dixin rengê jina

Pora xwe tênin ser mila
Da xwe bikin wek çavkila

Ev por bi wan qey difreye
Çi tiştekî baş lêheye

Sed heyf li wan xortê xweşik
Divin ji nû bibne keçik

Yan wê xwe nû bêkêr bikin
Yan wek jina du mêr bikin

Ev mêr û jin her ne yek in
Mêr û jina wek hev nekin

Nîşan ji bo mêra hene
Di her tiştî de peydane

Çima beran bû bi quloç
Mêşin çima bûye bi boç

Çaxê ku dîk bi kumçik e
Can sivik e wek çilpik e

Dîkê şinik bona çi ye?!
Ne hêk dikî ne qîqî ye

Mêrê ku bê simbêl û rih
Li felekê her tê gilih

Dibê: çima ez bê rih im

Ez bi hevala nagihim

Ger zilam hebî gijî
Dilê jina lê dibijî

Çaxê zilam pir nazik e
Li cem jina pir kalik e

Pîrek dibên ev keçik e
Çima wilo bê pirçik e

Şahîk û nerm û nazik î
Ji bo jina bû bazik î

Zilam divê wek wa nekî
Rengê xwe jê başqekî

Jin dilketin mêraniyê
Dilnakevin şêraniyê

Jin ji jina nakî evîn

Pez li şivên nakî şevîn

Pora dirêj bona çi ye?!

Ê ku deranî ka kiye

Ê ku divê her nazik î

Bi paqijî her badikî

Ew bûye wek xwedyê riha

Winda dikî dêm û guha

Porê dikin rengê hevor

Biskin li jêr û hin li jor

Hin por gij in por xelek in

Kengî dikarin wê şe kin

Dibî mezin rengê devî

Dilê mirov jê direvî

Hin mû girik hin mû sitûr
Xwezî ji wa ez bibme dûr

Hin rûreş in enî bel in
Porê ewan xweş kembel in

Mîna te qehfûrek rizî
Deynî serê wan bi dizî

Hin mû zer in por selik in
Şifqê li ser porê dikin

Weke tu rajî sêniyê
Te bavêjî ser gwîniyê

Nêrî çima nebû bizin
Ga kar dikin çêlek dizin

Xweda ne wek hev çêkirin

Ne wek Ewî em bîrbir in

Li hinka tê pora li mil

Kêfê dikin gelkî ji dil

Bi dil dibê ez çi jin im

Lê çi ked e ez bi gun im

Xwedî hebûna du çiçik

Da ez bibûma xweş keçik

Ev ne mêr e û ne jin e

Ew ne l' ser e ne li bin e

Heger jin e ber mêr bikî

Da qenc serî ser jêr bikî

Ê rihdirêj wê te bikî

Bibêjî qey tu keçik î

Xwezî bi wan xwedyê riya
Lê ne xwezî bi van gulya

Ê por dirêj serserî ye
Ya ew ji bo berberî ye

Ne rih dirêj ne serselik
Nakin xebatekî xweşik

Ê rih dirêj mane li paş
Ê serselik pir bûne şaş

Hey serselik di bîr werê
Wan gotinê çaxê berê

We go: Riha dirêj nekin
Hûn jî niha xwe gêj nekin

Porê ne berdin ser piya
Berdin riya serseriya

Da em bi hevdû re bijin
Em bi ziman hev nekujin

Hey zane û hey bîrewer
Tu zû ji vê rêçê veger

Ev çê biwe ji bo ziyan
Bêhiş û hindîş û giyan

Ev ne ji nîv werê me ye
Pir bê ked e ji der ve ye

Wergêre kum hem şal û şap
Wek bavik û pismam û ap

Gelkî ji porê çêtir e

Ê vê bikî ew bîrbir e

Pora dirêj biskê li dûv
Ez hew dinasim wa ji rû

Dêmê mirov çirgîn dibî
Xortê xweşik pê dîn dibî

Hawîr serî bûye gulok
Ew xweş dibî wek pîrhevok

Bawer ev e reşkê şevê
Ê ku mirov jê direvê

Ew vegerîn mîna berê
Wergirtine dûvê kerê

Biskê hina wek cezme ne
Simbêl û rih pê re hene

Ev tiştekî kes nedîye

Ev qeşmerî bona çi ye?!

Ev heşkerî xweş qirdek e

Meymûn û hirç û zirtik e

Dêmê xwe wê xet xet bikin

Biskê xwe wê qet qet bikin

Paşî bigêrin rengê xaç

Îdî çelip em bikne maç

Çawa bi vê tu ewleke

Ka çi xweşik bûn tê heye

Hîmê ewê tev agir e

Ê çêkirin ev gawir e

Tu pê dibî hirç û gever

Bêhiş nebe zû jê veger

Xorto bike bawer ji min
Tiştê mi gotî rast û kin

Ma tu nizanî ev çi ye?!
Kî vê bivê ew hîpî ye

Ez hogir û dostê te me
Bêtir ji wan postê te me

Ger tu dixwazî pêşketin
Ev çi tinaz û xet xet in

Zora neyar dibîr werê
Welat ji bin desta derê

Hîn be firok û dezgeha
Êrîş bike leşkergeha

Derxe bi lez petrol û zêr

Da tu biçî heyv û sitêr

Cîhan xweş e pir fire ye

Tenha ne ev goka me ye

Xweda dihêlî tu herî

Çima tu naçî nagerî

Lê tu heta serbest hebî

Tê her di vî karê xwe bî

Çaxê te nû kirne çuqil

Tu xwe dihêlî dûr û sil

Derdê te hingî xweşî ye

Tu hew zanî welat çi ye?!

Tu vê dikî tê hey herî

Tu dev ji tişta nagerî

Îdî tu hew zanî welat
Tê bê ev e kar û xebat

Tiştê mi got îdî bes e
Ê bê bere ew xweş kes e.

***

# Axaftina di gel çemê Dicle

Benga gelê kurdî me dî carek da dilê min
Derd û keserê wan hemî hatin ser kulê min

Min go çima her kes va di îro xwedî nav in
Ma em ne wekî wan in xwedanê guh û çav in

Ger ez bikim pirsê li min wê kî vegerênî
Bersivkê bidî min kul û derdê min derênî

Dil got here ber çem belê çemkî ji Kurdistan
Zanî çima em Kurd wilo mane dibin destan

Ew dosta dibênî gelê dijmin ew dizanî
Wê xweş bidî bersiv sivik û bê sergiranî

Çûm ber çemê Dicle serê demsalek biharî

Pêla pêl diajotin wekî hespê siwarî

Min bakir nebakir kengî ew cih didî ser min
Min zarî ji wî kir ji bo bersiv bidî ber min

Him him jê dihat û bi lez û bez diçû ber jêr
Min go wey li min ev hatina min çi bû bê kêr

Pêl çûn û dihatin yekê awir nedida min
Bêhna min çikî bû kul û qehrek jê giha min

Hêrza da dilê min bi bilindî me dikir qîr
Min go tu çima guh li min nakî hey çemê pîr

Min dî hê ji nû ve şek û pêla xwe giran kir
Tiştê mi digotin ewî guhdarî li wan kir

Min go hey çemê min divê em pêşî bibin nas
Da ez neçim Furatî ji bo çi herim Aras

Tiştê min jê zanî digo bêje belê kin ke
Vîna xwe derîne gotinê xwe ser û bin ke

Navê min e Dicle hey hevalo tu wî Nûrî
Tu vê berê zanî tu jî kurdî ne jî dûr î

Min go: Çemê Dicle tu ji ava me dibî der
Dijmin bi te şîn e lê welatê me dibî zer

Ê nav li te danîn berî her kes gelê Kurd e
Dicle bi zimanê me sivik bûne di vir de

Navê te yî şêrîn bi me Kurdan çi giran e
Naxwe tu jî kurdî ez û Dicle du bira ne

Vêca ez dipirsim ji te hey çem bide bersiv
Zanim tê bi kurdî bikî peyvê wekî hinguv

Hey çem bo çi her dem bilez û bez tu xuya ye

Bo çi tu newestî ne wekî lat û çiya ye

Roj û şev û her dem tev li ba te yek hewa ne
Her dem ez dibînim ku çemê me şek rewan e

Her dem dibihûrî te li keskî hê nepirsî
Mîna kesê bindest ku ji axê xwe bitirsî

Carek tu zelalî wekî camê geş û şîn î
Carek tu giravî sor û tarî wekî xwîn î

Bo çi tu seraser her dimênî wilo serxweş
Ma qey heye ku tu ji evînê bûye bêhiş

Bo çi di newalê hişk û hola dibihûrî
Pir cî hene lat in tu di wan de pirî kûr î

Karê te rewî ne ez nizanim çi dixwazî
Min kes nedî wek te ku seraser ew nerazî

Çaxê dibî zistan ez dibînim ku tu zor î
Bêbext û hevalî hem bê rêçik û bor î

Ma qey ne guneh bû te mirov pir kirin cendek
Bêhna wan dibûrî te zikê wan dikir bendek

Masî direvînin ewî laşî dikin parî
Min go qey tu dost î va xuya ye tu neyar î

Çaxê ku tu xurtî pir bi xumxum tu dibûrî
Dengê te yî dijwar tê guhê min hê ji dûrî

Kî bê te wî bajo tu jî bîra kesî nabî
Ger ew gunehkar û meger dostê Xweda bî

Pêlê te dirabin kes newêrî bibî derbas
Îdî tu nizanî kiye dijmin kiye ê nas

Masî kevir û dar çi mirovê bibî mêvan

Tê wan birevînî bi mirîtî bikî rêvan

Hey çem çilo her dem tu ji şehê xwe digêrî
Tiştê tu dikarî tu ji qadê dixepêrî

Dara tû dihilkî der û mala dikî wêran
Çikû kêzik û mar gul û pir kes dibin dêran

Çaxê bibî havîn tu çima wer dibî bindest
Tu pir tê vexwarin ê dibûrî dibî serbest

Hin tîne li çola ne ji avê pirî  dûr in
Hin dar û çiyane ji kulê te pir dizûr in

Îdî ez nizanim tu çima çêbû li cîhanê
Carek tu sitemkarî di carek dikî dîlan

Hey çem bixe bextê xwe dipêşî kê tu dîtî
Zanim tu çemê Nayrî û Mîd û gelê Sîtî

Cûdî tu vexwarin pey de Botî li te rabûn
Pir dewletê Kurdan berî her kes bi te şa bûn

Ew text û qiran û şehneşîn çûne bi ku de?
Dengê wa nema tê, bûne bin ax ev ji zû de

Xwezya bi wî çaxê di vî warî em xwedî bûn
Xortê me bi tore jin û qîzik bi fedî bûn

Xişrê wan li wa bû ew dibûrîn wekî qaza
Govend û sema bû li serê kokel û gaza

Mêrê me li çola dikirin leystik û nêçîr
Xatûna ji zêrê zer dipêçan ser û pêsîr

Şahê me di hingî li me Kurdan kirin dadî
Gelkî me ji hev dî, di wê çaxê gir û şadî

Hafa te çemî tev kiribûn bax û gul û dar

Şalûl û çivîka dikirin pirpir û hawar

Dijmin çilo hat û ev welatê me cuda kir
Marek dev ji hev bû xwe li Kurdê me du ta kir

Hey çem te çima hişt dijminê me li te rabin
Tê hiştiba hew avê vexwin tevde ziwa bin

Car car tu di cihna hin ji dara dikî avî
Dîsa tu diçî xwar her wekî ku tu di davî

Pêlê te çima ew nekirin jêrî qula de
Xwedyê xwe yî pêşî tev te hiştin di kula de

Hey çem çemê Amed çemê Bota çemê Şingal
Guhdar bibe îro xwe negêre bê guh û lal

Ka tu bi evînî tu wehaye wekî min got
Yan jî serxweşî tu xurxura te guhê min sot

Dîn û bêhişî tu, ez nizanim qey tu gêj î
Wek şahekî mara xwaro maro pir dirêj î

Dijwar û sitemkarî gelo tu gij û têr î?
Yan jî tu xizanî ji neçarî bar buhêrî

Yan tu dibê cîhan pirî teng e wekî çap e
Lewra tu diçî zû da li qadê nebî şap e

Min dî gumgum çem hat û pêla xwe da pala
Zîzok tê de bûn ger bûne kovik wekî çala

Wek mar serî da min hat û da zû min bibî xwar
Revyam ji devê çem da kef û kel jê bibî sar

Goya peyivî çem ewî destûr dida pêlê
Çelqek pijiqî min herivî jê binê kêlê

Zanim xeyidîbû digo boçî te dirêj kir

Bo min bû derengî ser û canê mi te gêj kir

Tiştê ez dizanim tu jî hatî bo şerê min
Pêşî mi go bêje belê peyvê sivik û kin

Bawer bike xorto gilihê te ez bihat im
Çaxê mi nemaye tu dibênî ez hilat im

Wek te nebêkar im ku li ber te bikim peyvê
Va tu bike pirsê ji vê qadê ta bi heyvê

Keskî bersiva te bi van tişta hê nedaye
Ma qey ez tenê me te girê xwe di min daye

Cîhan jî wekî min her û her carek ne rûniştî
Zîzok e li hawîr xwe diçî bê ser û bêpiştî

Şahek mi heye ez çêkirim her dem weha me
Ev kar ewî da me pîs û başî ev giha me

Tiştê tu dipirsî ez ji te gazinê nakim
Destûr bo mi nîne bidim bersiv ger te şakim

Naxwe tu jî gazin mexe ser min hey kurê baş
Da kes bi vê pirsê wekî te xwe her nekî şaş

Çawa tu dixwazî ji mi pir kes vê dixwazin
Hêzdan tenê zanî ji me îdî neke gazin

Pêla me xwe ajot û digot îdî veger mal
Ez mam di kulê xwe dilê min sar bê hiş û lal

Îdî min fedî kir piştî ew çû ez tenê mam
Min go: hey çemê min tu jî maye bê kes û kam

Hingî ku tu xweş bû hey çemê min di cîhanê
Dijmin pir dihatin em kirin vê kul û janê

Hêvî heye dîsa em li bin darê te şa bin

Zora va neyaran ji te rabî em aza bin

Derdê min giran in ez nikarim wa bibêjim

Ger pey de herin ez kedê nakim xwe dipêjim.

***

## Ev dem ne dema ku Kurd avaniya çêkin
## Weke vî şêxê me yê li vir

Di nîv deşta Xelef Axa mi du burcê xweşik dîtin
Li hember gohê Bagokê li gundê Şêxê Aşît in

Bi hîmek pir teyûr danîn çi hindazek xweşik pê re
Mirov zanî ewî çêkir xwedî wewdan û hem zêr e

Bi şax û pax û hêwan in, ji hawîrê xwe rengîn e
Bi taq û dergeh û pac e gelek qozîk xanî ne

Du burcê tev memûş in, lenger û caxê wekî zanîn
Li hawîrê ewan burcan çi hewşek pir fireh danîn

Li gorî dil ewan çêkir ji bo ku hew bibî wêran
Kesê ku pê dibî ageh ji bê gavî diçî seyran

Çikû avakirin herdû ne wek burcê di vê çaxî

Bi hindaza kevin çêbûn li vê çola çep û axî

Seda sed karkirin tê de ji sal û nîvekê bêhtir
Dikarîbûn bi mafê wê bikin ava dehê çêtir

Di piştî herdû avabûn, xwedî xwarin li ber danî
Birinc û goşt û tiştê xweş li ber burcê kirin kanî

Gelo ew xwarina çêkir li ber burcê xwe yê rengî?
Ji bona ku li nav şêx û mela jê re bibî dengî

Gelo ma ew mela û şêx li malê xwe nedîn xwarin?
Belê em tev dizanin ku  hemê têr û xwedî kar in

Kesê ku pê nizanîbû digo rojek çi pîroz e
Ji bo azadiya Kurdan hewar û kêf û Newroz e

Hejmarê Kurd û Kurdistan ewan anîne gasînê
Li ser gora kesê kuştî dixwînin peyv û Yasînê

Li ser Şêx Ehmedê Xanî bi serbestî dikin dîlan
Li ber gora Mem û Zînê dikin govend û şadîman

Hezarê Kurd ji Îraqê di Sûrî de belabûne
Xwezî şêxê gelê kurdî wekî şêxê gela bûne

Bere xwarin bida destê pepûk û pîr û jarê me
Nizim nedbûn ti carî ew dibin darê neyarê me

Di dil de em dibêjin ew ji maxûl û girê Kurd e
Ewê canê xwe windakî ji Kurdan wê herî Kurd e

Çima ew xwarinê nadî kesê gundê xwe berdan e
Li zarok û li pîrê wa çima nakin ti serdanê

Bilez raje sedê zêran here sînor bike pirsê
Bide wan rêwiyê Kurdan ji dijmin tu neke tirsê

Emê hingî bizanin ku ji bo Kurdan tu dilxwazî
Ne ku îro li TilMerûf di burca de tu xweş razî

Here destan bide destê birayê Esed û Îsa
Di bin serdariya Barzan bikin cenga ker û pîsa

Di wê roja welatê Kurd bibî  serbest û azadî
Di hingî burc û qûnaxa bikin ava bi dil şadî

Belê kes pê nizanî ka Xwedê bo çî wilo çêkir
Di vî çaxê reş û tarî çima destê xwe wî pê kir

Gelo çawa dilê wî xwest di vê çaxê bikî ava?
Dizanî zor ji dijmin tê seraser ew di her gava

Ji gundê wan gelek perçe ji destê wan di derxistin
Kesê hinkî bilind bona wekî wana ji serxistin

Gelo wî dil bi çi xweş kir hêta ku ew bi vê rabû?
Dibin destê kesê Be'sî bi van burca çilo şa bûn

Welatê Kurd ne yek dest e heta ku tê de serdest bî
Mirov çawa dikin kêfê di wî çaxê ku bindest bî

Sînor nêzîkî burca ye nikarî ew  di ser wî re
Bibî derbas hêta ku tirk bidin destûriya jê re

Ne Kesra ye di wan burca li Îranê bikî ferman
Ne Barzan e di vî çaxî kulê Kurdan bikî derman

Ne wek Xalid cîhangêr e ji Şamê ta bê Kerkûkê
Hezaran bênî ber destan bikî govend wekî sûkê

Ti axa wî gelek nîne ne Ebdullahê Ehrara
Ji bona sed hezar cotan di rengê wî ne serdar e

Ne wek Şahê li Serhind e ne wek Şahê Buxara ye
Ne serbest e wekî wana dibin destê neyara ye

Gelo ma ew nizanî Kurd dibin desta binalîn e?
Li Barzanê nizanî ku hewar û qîr û talan e

Bere carek bibî guhdar li ber dengê ber û topa
Çilo Kurd û neyar îro li pey hevdû dibin şopa

Gelo Radyo li cem nîne gelo kes jê re nabêjî?
Gelo qey ew nexwenda ye ji warê Kurd xwe tavêjî?

Gelo ma qey gelê kurdî li cem wî tev derewvan in?
Çima şêxê gelê tirk û 'ereb bo wan dilovan in

Şewat û kuştina Kurdan çilo cergê wî nerm nakî
Li pîr û jar û zaroka çilo çavên xwe germ nakî

Heçî mêr e netenha ew li ser karê xwe çavnêr e
Ji bona herdû cîhanan di her warî de wek şêr e

Bijî Barzan ew e tenha ji bo Kurdan dikî kar e
Niha wî guh neda burca li ser dijmin çi dijwar e

Ewî jîna xwe kir derbas di erx û çal û zindana
Dil û canê xwe da Kurdan heye wek wî hebin zana!.

***

## Çima Kurd neçûn asîman?!

Ma çima pir kes gihan ber asîman hê em li jêr
Ma gelo yê baş em in, ya em nema hatin bikêr?

Ma çima hin bûn xwedî top û firok û qumbere
Lê çima Kurdê reben hê nû li azadî gere

Ma çima gelka zimanê xwe kirin yek dar û dest
Lê zimanê vî gelê Kurd maye bê serkar û mest

Hey gelê kurdî gidî ma tu çilo hîndiş dibî?
Her tu rê winda dikî tiştê tu pê rabî çi bî

Sofî û şêx û melê tirk û 'ereb gelkî hene
Lê hemû dilxwaz û dostê xwendina zarê xwe  ne

Sofî û şêx û melê Kurd pir dibên em 'ereb in
Ew divên nav û nîşanê Kurd li cîhanê nebin

Ma gelê cîhan seraser bêhiş in dozê dikin
Bo zimanê bav û kalan xwe ji dil serjê dikin

Ma hişê Kurdan di cîhanê ji yê wan bêhtir e
Ma çima dezgeh û karê wan ji yê Kurd çêtir e

Kurd hevalê her Mislman û mirovê paqij e
Lê li ser xwar û nebaşa har û dijwar û gij e

Ev ziman û reng û nîşan û girêdan û welat
Tev Xwedê dane mirova beş kirin bona xelat

Ger Xwedê ev dane tirk û 'ereba dane me jî
Dê bere em wekî wa bin ma çima cîhan hejî

Ê misilman tev birane va Muhemmed gotiye
Kes di ser keskî re nîne bil ji karê qenciye

Em wekî wane di ol û hem di cîhan û hebûn

Wê dema ku em xuya bûn ew di cîhanê nebûn

Ew xwe naxin rêç û maf û gotinê pêxembera
Em dixwazin gotinê wa bi guh û çav û sera

Em ji bo xwarin û zêra xwe bi dijmin nagirin
Em bi bindestî û nizmî bê niyazî namirim

Bo çi axayê welatan tev li dûv şahê xwe çûn
Lê beg û axê me Kurdan yek li dûv ê dî neçûn

Hey begê Kurd her welatek yek di wî de mezin e
Ma hezarê beg û axa wê çi kin bona çi ne

Hiş werê xwe hey begê Kurd rû li cîhan nanerî
Ma tu hê jî dev ji vê serhişkiya xurt nagerî

Şo'iyê xelkê mezinbûna welatê xwe divên
Da bikin yek ji gelê xwe serek û şah û şivên

Da bizarê xwe bixwînin şop û nîşanê kevin
Da cîhan tevde bizanin tev mirov in wek hev in

Şo'iyê Kurd bi zimanê Kurd û Kurdistanê dijmin in
Her ji bo dijmin heval in bê nijad û bê bin in

Sofiyê Kurd, Şo'iyê Kurd hem begê Kurd bûne yek
Tev li ser Kurdan ji dijmin re dibin pîlan û çek.

***

## Hey mirov ka bike hîndiş

Hey mirov ka bike hîndiş bo çi tu tişta dikî
Hene teşt in pir giran in tu li ser pişta bi kî

Tû mirovek her tinîne bo te yek xanî divê
Bo te rojê bes e nanek tu du sed nanî divê

Tû dizanî ku tu dimrî yan derengî yan bi lez
Tû ji her tiştî dibî têr yan bi gezkê yan du gez

Tû wehaye ger li cem te hebî hindik ya gelek
Tû nikarî wergerînî derd û bê tarê felek

Tû divê gelkî hilênî hindikek rojê herî
Her wekî jîna te yî çû tu dibê wê vegerî

Kengî rêjê ku bihurîn hatine destê mirov
Nayê destê tu mirova vê dizanin jîr û hov

Ger tu bê bo zariwaye pir hene kur dûnde ne
Pir dikin ew keftelefte her wekî sed şûnde ne

Ger li cem te hebî sed par tu yekî nadî kesî
Tû b' dilê xwe bo cîhanê rast û çep tenha besî

Tû divê piştî tu bimrî bo te hewdan pir hebî
Her tu navê ku tu bimrî bê guman û berze bî

Tû divê ku zariwê te her cihê bin dest bikin
Tû divê pesn û nîşanê te gelek serbest bikin

Tû divê xwîna te birje da hinek bê aferîn
Derziyek zûr tu bibînî tê bikêşî qehr û kîn

Tû dizanî tu bêhiş bû piştî ko tu bê herî
Tû dibînî tu piçûk bû tu dibênî tu kesî

Tû dibînî tu bi kêfî ku ji nişka nexweşî

Tû dibînî ku tu saxî wa mirin tu bêhişî

Tû nizanî kê wilo kir kê weha kir tu kerî
Weke zarokê li pey dê bê şiyarî digerî

Tiştekî tu çê dikî ji her wekî ku ne tiwî
Tû nizanî çilo hatî çilo pey wî re çi wî

Tû divê her tu bimênî li cîhanê bê mirin
Tû divê her tişt li cîhanê li gor te bê kirin

Ka ji bo ku hin bibêjin heyf li vî mêrê şepal
Ya ji bo ku dil bisojin da bibêjin wey delal

Yan ji bo zaro bibêjin em ji vî bavî xweş in
Yan ji bo dijmin bibêjin em ji vîna dilreş in

Naxwe tu bona du tişta tu ev î karî dikî
Yek ji bo kêfa hina bî ya hina da bi çikî

Ev mirovê ku weha bî sax dimênî çendekî

Piştî bimrî pir dixwazin wî bibênin cendekî

Hin hene kêfê dixwazin lê ji bona xwe tenê

Gerçi piştî mirina wî tev cîhan pê bikenî

Ew dibê çend zariwê min tevlî zêrê mi bes in

Ew nizanî dost û dijmin bo çi ne û çi kes in

Ji mirova ne fihêt eji Xweda ew nakî pirs

Ne ji qencî ne ji pîsî ne ji xwe ew nakî pirs

Ev mirovê ku weha bî ger ji wî çêtir hene

Ê bi vî rengî xuya bin bê nijad û ewlene

Em mirov in ne dewar in bes bixwazin xwarinê

Yek li gorî hindera xwe em bikin pê karinê

Em mirov in her divê ku em li gorî hiş bikin

Ne ji bo canê xwe tenha bo mirova giş bikin

Lê divê em qenciyê pêşî bikin ji bo xizman
Piştî ware ê te û wan digihînin hev ziman

Piştî ware yê xizan bî li hemî war û cihan
Tû bibe dijmin ji bo yê ku dikin reng û ziyan

Hew dibêjim hey hevalo dehker e pir mezin e
Ê negotî gelkî mane, yê mi gotî hê hene.

***

# Welatê Kurd difra cîhan û Asya ye

Di cîhanê cihê Kurd e gulazer
Li ser Asya dikî difrê seraser
Li ser textê xwe rûnişt û li hawîr
Temaşa kir li ser axa (Ferawer)
Keça Restem wekî Restem dirêj e
Nedî kes min di rengê wê bi bawer
Ewê textê xwe danî Amed û Mûş
Ji bo destê xwe bavêjî ser û ber

Serê dighê çemê Menzûr û Halîs
Kemaxê wê diçin şehra Mehabad
Du lingê wê diçin deryayê Hirmiz
Ji rewşa wê hemû cîhan dibî mat
Li ser laza diraxî por û çarî
Gulî dighêne ser gohê Erarat
Li ser Derya Sipî biska dihûnî
Du destê wê diçin Şingal û Rayat

Biyanî her li hawîrî rê dirûnin
Dixwazin jê bi  maçin dêm û gerden
Li alê ber dirûnin lawê Tûran
Li ber şanê dirûnin Rûs û Ermen
Li kamaxa dinêrin firs û tacik
Heta bighê binê du ling û damen
Ji ser çogê heta bighê guhara
'Ereb her lê dikin seyr û ger û ken

Ji sînga wê du çem her têne xwarê
Li pêşmalê dibin parêz û naraz
Di rûnî ser Xelatê da li Tatwan
Bikin seyrê li wê gola bi hindaz
Vexwî avê ji Xabûrê Cizîrê
Ji Şingalê hejîr tênê bi gilwaz
Dirazî ew li Sersing û li Hebler
Li Bedlîsê dikî nêçîr û perwaz
Çi tiştê ew dixwazî têne ber wê
Ji Kurdaxê çi zeytûna didî hev

Dixwî sêva ji Xarpût û Meletya
Tirî dehreng ji Omerya dikî dev
Dikî agir bi wê finda li Kerkûk
Wekî rojê ji cîhan radikî şev
Li ma'den çê dikî ew bazinê zêr
Ji ber Toros genim tênî lev û lev

Hirî tenê ji Mûş û Erzirûmê
Li Wanê çê dikî ew merş û mafûr
Li Barzan çê dikî ew şal û şapik
Li Çermûkê dideynî wan gulê hûr
Dişo biskan bi misk û her gulavê
Ji ava wan gulê nêzî Çebexçûr
Diçî xemlê li wê bejnê girêdî
Li cem qîzê li Botan û li Deynûr

Tîpistanê dixwînî ew li Amed
Dixwî mast û birincoka Qereşdax
Di çaxê ew zerî carek ne xweş bî

Li Şeqlawe dixwî meywe dibî sax

Dikî ava li Batman û Şehirzor

Tîpistan û sera û xanî û cax

Dixwî xurma ji darê Xaniqînê

Welatê wê hemî bax û rez û dax

Ji Heskîfê ji 'Eyndîwer dikî der

Sedê bîran ji petrola Şihara

Li Mêrdînê li Sêrt û hem Hekarê

Li Dêrsim ew diçî seyra zinara

Nisêbînê dikî kombar û kêşî

Ji bo dan û pez û dar û hinara

Kesê naskî nema karî bikî xew

Dibî agir di nîv cergê şiyara.

***

# Welatê Kurdan bi nav û deng e

Welatê Kurd ez im her dem
Bi nav û deng û nîşan im
Meger îro ji derda re
Pepûk û jar û tîşan im

Bi rewşa xwe bi tenha me
Ez im berfa li zozana
Ez im dêka ciwanmêra
Dilêr û jîr û hozana

Çi qîz im ez gulî sor im
Bi rist û zêr û morî me
Cihê Kurmanc û Zaza me
Bi Bano hem bi Lorî me

Bi goh û deşt û rûbar im
Bi yar û kom û xanî me
Bi dehl û mêrg û bustan im
Bi bax û dar û kanî me

Biharê ez gulistan im
Wekî xatûnê terxan im
Bi gamêş û bi garan im
Cihê karan û berxan im

Di havînê ziwa qad im
Hevalê pîr û kala me
Bi dar û bênder û ka me
Civîna kar û pala me

Di payîzê bi avîk im
Bi şewq û rohnîk û rîz im
Bi kar û bar û cobar im
Rez û şîranî û gûz im

Zivistana wekî cam im
Ji berfê gewr û hem boz im
Bi baran û bi xwîsî me
Bi gêdûk û bi bahoz im

Werin zêra werin zîva

Werin hesin di axê min
Çi findeşil heye îro
Di jêrî goh û şaxê min

Erê her kes me Kurd anî
Li ser qadê xwe kir zava
Nehişt min kes berî Kurda
Ji sînga min vexwin ava

Hezar salan mi derbas kir
Bi kêf û şahî û dîlan
Me jîndarî gelek çêkir
Ji bo ava bibî cîhan

Gelo tiştek ji min kêm e?
Bi nêrim  hûn bi hişdarî
Çilo kêm dî gelî kurda
Ez im hîmê gelê Arî

Çiyayê min li Hewran e
Serek bo wan Erarat e

Li pey wî Cûdî û Sîpan
Dikim seyrê li Exlat e

Du golê min hene hêja
Li Îran û li Wanê ne
Ferat û Dicle û Mehzûr
Ji min pêve çemê kêm e

Bi goh û deşt û pehnava
Di rengê text û dergûş im
Bi Qers û Wan û Bedlîs im
Hekar û Amed û Mûş im

Cihê Sûbar û Cûdî me
Cihê Lolam û Kaldî me
Cihê Mîtan û Nayrî me
Cihê Kaşan û Madî me

Heçî Gurgîn û Guhderz im
Kiyaxisro kurê min bûn
Di gel Kawa di gel Restem

Sedê wek wa ji ser min çûn

Çima ev bû hezar salek
Nenasê min dikin ferman
Nexweş bûme nema zanim
Çilo peyda bikim derman

Gelek Zabê'm ziwa bûne
Çiyayê min gelek rût in
Di şûna xanim û şahan
Hinek dêwê ziman şût in

Dibî winda zimanê Kurd
Serekdar hin biyanî ne
Zimanê wa ne yê Kurd e
Nema zanim kurê kî ne?!

Çemê û avê mi bê kêf in
Gul û darê mi tev hişk in
Qûnax û xan û caxê min
Seraser kavilê mişk in

Neyar lawê mi pir kuştin
Di bin axê bi nalîn in
Heçî sax in girêdane
Evîndarê wekî Zîn in

Li ser min qey çi çêbûye
Seraser qîr û hawar in
Genî bûm ez ji xwîna sor
Neyarê min gurê har im

Hero karê me giryan e
Pepûkê jar û hem gêj im
Ezê pora xwe nû jêkim
Ezê xemla xwe bavêjim

Guhar û gerdena deynim
Çek û zêra bixin qasê
Girêdim ez reş û şîna
Li xwe dergeh bikim asê

Ezê van bazina gêr kim

Ezê çibkim ji qolana
Hewar kim ez wekî dîna
Li bajar û li kolana

Ezê van kemberê zîvî
Li ser hevdû bikim kêşî
Kiras û taqiyê gulgûn
Bixim çara hevirmîşî

Ezê van rêşiyê zêrîn
Di gel van kofiyê deh reng
Ji hevdû xim wekî pembo
Li ser hevdû bikim yek peng

Hilînim ez di şûşa de
Hebîr û misk û gulavê
Kil û neynik xina tarî
Mi hetwana riwa navê

Nema zanim çi tevdêra
Şikestin min per û bazik

Ezê pêxwas herim çola
Bi van lingê xwe yî nazik

Li ser Kurdan birîndar im
Tu carî wan ji bîr nakim
Herî kengî ezê Kurdan
Bi carek din bi xwe'r şa kim

Ne şerm e hûn weha razin
Li ser min hew bikin pirsê
Mixabin hûn kul û derdêm
Nekin derman ji bo tirsê

Belê tarî dibî rohnik
Ji Kurdan her bi hêvî me
Çima ez xanima dilber
Ji bo dijmin bi nêvî me

Niha mizgîn ji bona min
Ji cem Hêzdan ketin xwarê
Kurê min Mustefa rabû

Ji bo min ketye hawarê

De rabin tev kurê min hûn
Ciwan û nazik û terxin
Di gel Barzan bikin arî
Neyarê xwe sivik derxin

Bijîn kuştî ji bona min
Heçî têne bicih sozê
Di gel Barzan kurê hêja
Ji bo min pir dikî dozê.

***

## Li ser alaya Kurdistanê

Hey ala raser xanî          Bo Kurdan tu nîşan î
Naz û şeng û tirxan î          Kes û sor û mircan î
Durva ar û Îran î          Berya Zerdeşt û Manî
Tu qîza Qadî Xanî          Dildara Kurdistan î

Ala sor û kesk roja zer tê de
Doz û ceng û şer tu'j bo Kurd anî

Terx û qîz û şehnaz î          Gulgûn û gerdengaz î
Ber bala serfiraz î          Dehl û bax û naraz î
Ser enca rengê baz î          Bo Kurdan tu daxwazî
Ser goh û deşt û gazî          Ser darê gûz û mazî

Ala sor û kesk roja zer tê de
Doz û ceng û şer tu'j bo Kurd anî
Gewr û rind û şêrîn î          Zîv û l'al û zêrîn î
Pir kevnar û dêrîn î          Bo Kurdan tu nêrîn î

Ba û hilmê bêrînê
Davêjî dil qîrîn î
Bo merdan tu wêrîn î
Bo dijmin tu nefrîn î

Ala sor û kesk roja zer tê de
Doz û ceng û şer tu'j bo Kurd anî

Tû heyfa ser welat î
Armanca Mehabat î
Ser pozê Erarat î
Berfa raser Exlat î
Kendal û kaş û lat î
Tu burca sêsed qat î
Tû roj î nû hilat î
Ser çavên min tu hat î

Ala sor û kesk roja zer tê de
Doz û ceng û şer tu'j bo Kurd anî

***

## Welatê ezbenî welatê Kurd e

Hatim welatek mezin peyva ewan ezbenî
Agir dabû ser cegerê min, dilê min jenî
Min go zimanê min e yek im ez û van bira
Rengê hev in serbiser çav û ser û hem zenî
Yek hat û destê mi girt nişka ve navê mi got
Dilê mi lê bû şiyar nû ji xewê hilçenî
Digo: Ez û te Kurd in ji min tu bûye winda
Me ramijandin ji hev du  birh û çav û enî
Em tevde çûne çiya, nema xwe girt û girî
Qîr ji mi jî dirabû dilê mi xweş kir kenî
Digo: Bira tu nû ye girî ji te'r nebaş e
Min dî gelek birîndar laşê hina bû genî
Hinek xortê bi sembêl hinek qîzê gulîsor
Qîra mi çû ber felek cîhan  bi min bû tenî
Hişê min çû di hingî nema zanim çilo kim
Mîna Memê birîndar gindirîm hatim binî
Birçî bûm ez di çalê, mi dî baxek xuya bû

Ez derketim gihamê, ji wî mi sêvek çinî
Mi dî yek tê ji wêde veşartîbû riwê wî
Digo: Ez mêr dixwazim. Mi go: Ma qey tu jinî
Digo: Ez pîrebî me ji birçîna mirî me
Tu qencîkê bidêre li ser vî laş û tinî
Mi nanê mi nîne, te agir da dilê min
Digo: Sêva te jêkir tê bidî min jê hinî
Mi go: Xuha mi rabe here gûza werîne
Wê ber dilê te bigrî ger tu bixwî wî qinî
Digo: Bira nikarim destê mi nagihê ser
Mi go: Ezê va herim xuya dikî tu kinî
Wê deynekir dirabû ji bo gûza werînim
Li pey mi hat û girî çend kêliya pêjinî
Mi go: Xuhê ji bo çi gumana didî me
Pinek li wir xuya bû, rûnişt li ber wî pinî
Digo: Baxê me rind e belê di nav de hov in
Wê te bixwin ezbenî di nîvê wê gulşenî
Mi sêv dayê di cih de, em bûn xuh û birê hev
Çaxê mi dî dibêjin bi zarê min: Ezbenî.

## Hey welat

Hey welat xwîna mi gorî lat û zinarê te bî
Nav û dengê te xuya bî her deman tu jînde bî

Kurd ji bo te her dibênî ceng û halan û şeran
Hem dikî doz û xebat û gilî û pir tevgeran

Pir bi te em serbilind in her hebî tu hey welat
Rexşe Restem vaye anî bo te mizgîn û xelat

Em diparêzin cihê Kurd ber neçin ev al û ol
Em dibin mertal û kozik lek bi lek  hem qole qol

Em divin şop û nîşanê bav û kalê xwey berê
Ê biyanî ku ji der ve bere neghên vê derê

Em li axê te mezin bûn em bi avê te dijin
Em bi danê te dirabin her piçûk û mêr û jin

Em ne Ewrupî ne ku em zêr bikin kombar û genc
Em ne xelkê Rohilat in xwe bixin ber kar û renc

Em ji warê nîve rastin li welatê Rohilat
Em bi navê Kurd xuya ne pê dikin kar û xebat

Em li gor kêfa welat in ka çi qenc e wê dikin
Her biyanî bil ji yê xwe ka bi peyvê kê dikin

Şûrevî hem rast û çep tev ne ji bo warê mene
Tev ji bo dijmin dibazin ew ji Kurdan perçe ne

Rûs mirovek xape zane her mirovan şaş dikin
Her bi qîr û hêlemana ew xwe pak û baş dikin

Xelkê benda Etlesî cîhan bi zêran dikirin
Ew bi lavan serê bavan bi hêsanî dibirin

Tev ji bona xwe dibazin dizanin zor e dem

Ew bi Kurdan naguhêzin 'ereb û tirk û ecem

Em sînorê xwe dixwazin em zimanê xwe divên
Em divên ku ji xwe rakin serek û şah û şivên

Kurd seraser ku nedin dûv pêhlewan û zanekî
Ger bi xwîn û hinera xwe Kurd welat ava nekî

Kes nikarî me ruhakî ji kevanê dijmina
Kî deha tênî ji bo xwe ku nema nadî hina

Va niha em bo neyaran bûne berdest û geda
Kes nizanî wê çi çêbî bil ji tevdîra Xweda

Vaye Barzanî di pêşî perçekî Kurdan vegirt
Kî ji wî çêtir xuya ye bê tinaz û qerf û zirt

Tev bidin pey vî mirovî pir mirovek zane ye
Qehreman û pêhlewan e bo me ew hingame ye

Em bi wî ne ne bi Xandî ne bi Lînîn radibin
Ne bi Dîgol ne Tiroman ne bi Çirçir şa dibin

Kî bikî qencî bi Kurdan qenciya wî sersera
Kî bi xwarî bê me Kurdan ew hevalê qeşmera

Ê bi Kurdistan ne bakin ew mirov in bê ked in
Çar kenar hawîr bibin yek dev ji hevdû bernedin

Em pilingên ser çiya ne em ji bo hevdû bes in
Tu ji rabûrê bipirse ev gelê Kurd çi kes in

Her bijî Kurd hin bi hin  ew ber bi azadî diçî
Her bijî Barzanî derxist temel û hîm û riçî.

***

## Em Kurdistanê dixwazin

Em Kurdistanê îro dixwazin

Em tev hişyar in hozan û baz in

Ji me'r çênabî nûka em razin

Welatê şêrîn tu meke gazin

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî

Ma kê tu hiştî weha bindestan

Ji îro pê de em weha nakin

Emê xwe tevde bi hev teba kin

Vî darê dijmin ji ser xwe rakin

Şarê Kurdistan dilxoş û şakin

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî

Ma kê tu hiştî weha bindestan

Ji bo te îro xwe dikin gorî

Kurmanc û Zaz û Sorî û Lorî

Ji ser me hilat nizmî û korî
Rengê biharê tev şîn û sorî

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî
Ma kê tu hiştî weha bindestan

Baqerda Bota bajarên welat
Kerkûka Sora şehra Mehabat
Zaxros û Turos Agirî û Xelat
Em dê bistînin bi zor û şewat

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî
Ma kê tu hiştî weha bindestan

Ev Kurdistan ecîgehê mêran
Cihê malbat û merd û dilêran
Xanimê nazik rind û sitêran
Çawa hemî man bindest û wêran

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî

Ma kê tu hiştî weha bindestan

Bikin temaşa gund û bajaran

Çiyayê bilind devî û daran

Av û şînahî kerî û garan

Bona çi ew man bona neyaran

Tev dar û Buhiştî j' mêrgan miştî

Ma kê tu hiştî weha bindestan

Çiyayê zêrîn deştê te zîvî

Ma kes dikarî wana bipîvî

Bi sêv û tirî gûz û bihîvî

Di nîv cîhan de sitêr û hîvî.

***

## Derdê Kurdistanê giran e

Derdekî min pir giran e sed çiya jê bûn birîn
Cerg û can û dil bi carek tev hinavan kirye xwîn
Kes nikarî bê nerast e zanibî ger ew çi ye?!
Ev welatê bav û daye lew kirim bê kar û dîn

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Sax nemînim ger nerazim ez di himbêza te de
Ger li ber şaxê te rûnim dê hebin xort û ciwan
Ger mirîbim piştî deh sal ba ji alî te de bê
Bîn ku bê min ji gulê te dê bibim sax û rewan

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Ez te nadim bi ti axa ji welatê di cîhan
Hingiv û şîr û gezo ye rohniya min tu welat
Rojî û pesn û limêja wî kesî bêhode ye

Ger şev û rojê seraser ew nekî bo te xebat

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Ji evîna te welat im putperestî bûye der
Bi te Hêzdan hate xwarê serekê tişta tu wî
Al û êl û ol bihûrîn dem û şapat û derav
Lê tu wî şûna piyê Kurd hê wekî pêşî nuwî

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Ax û avê te ne derman bo evîna vî dilî
Hê ciwan im ji kulê te nû sipî bûn bûme kal
Ma çilo nakim hewarê kî ji min gazin dikî
Çawa bindestê neyaran zariwê Gurgîn û Zal

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Ger hebim ser goh û Cûdî li welatî meyze kim
Ronikê çav dê bibarînin wekî barana bi tav

Mêrgeha (Nûh) dê bibînin bê civat û tevger e
Ji çemê Dicla dibarî li ewî hilm û xunav

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Di Roava Rohilatê wek pira Bayman bibîn
Here Darê here Bafid here Derbend û Kemax
Her Şehîran nerê binyan here Westan û Cizîr
Here Bedlîs here Mêrdîn hem Diyarbekr û Hetax

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Kevir û darê cihê Kurd bi me zêr û gewher in
Şax û hebler çi dizanin sere û hem Îremê
Va diçim şaxê Şerefdîn Helekor û Qeredax
Hew diçim Libnan û Xûta vaye Sersing vê denê

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat
Dêrsima nav wan zinara ma bi Izmîrê didim
Hîn bi Avista Zeradeşt vî cihî naskir Xwedan

Tehtik û lat û zinarê vî welatî qey didim
Bi gulistan û bihara li Dimeşq û Zebedanî

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Erebistan tev seraser çi keda min jê heye
Hecî Umran û Gelale Kerbela û Necef in
Laleş û Cûdî û Urfa wekî wa hê pir hene
Tev tewafgahê welat in ger niha lat û qef in

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Mêrgeha her kuştiyê Kurd zû divên herme ewan
Peyde ez herme tewafa Ke'be û guhê Uhid
Ger ji bo peyxemberê xwe şer bikim ez vê demê
Çi divê herme Felestîn vaye Barzan bûye Lud

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Cejn û nûrojê xwe nadim bi ti nûrojê mezin

Markis û Xandî mi navê rêber im Barzanî ye
Min divê bême veşartin di ber û axê welat
Bere gorî bim ji bo Kurd ne diber erzanî ye

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Şal û şap û kum û kolos ber girêdana me bin
Ne wekî Ewrupiya bim ne bi dismal û 'egal
Bere qîzik xwe bipêçin wekî Zîn û sitiyan
Qerqerê xwe bere çêkin sor û kesk û zer ji al

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

Zehreva yê min e kurdî her Xwedê ez dame Kurd
Bav û kalê me jî Kurd in lew niha ez mame Kurd
Axê Kurd ez afirand im bo mi her endamê Kurd
Ez li axê Kurd mezin bûm li devê min xame Kurd

Lew dibêjim ax welat ax welat ax welat welat

***

## Mizgîna welat

Kurdistana Kurd mizgîn û şadî
Didin te îro peyma yê Madî
Bibhîze nûka dengê azadî
Te b' destê dijmin îro bernadî
Sor û Zaz û Gor, Kurmanc û Mukrî
Bona ceng û şer kirin Amadî

Hey textê Cûdî qada Sûbarî
Hey maka cîhan hey şana Arî
Cîgahê cenga Zihakê marî
Îro li Kurdan pir ke guhdarî
Bêhtir ji ber dem bo te dibazin
Desta didin hev ji her kenarî

Lawê te îro tevde dibin yek
Dozê dirakin sed kom û lek lek
Ji ceng û cana hildigirin çek
Çavên xwe digrin li ber pêl û şek

Hin diçin cengê hin kar û bar in

Dijmin hew karî bikî xap û dek

Hey Îmalê Kurd kêfa xwe bîne

Dara te yî hişk va bûye şîn e

Kurd bûye hişyar te di bîrê tîne

Zor û bindestî nûka hiltîne

Tê bikî bawer vê carê rast e

Ger tu bizanî ka rêber kî ne?!

Ti'd bênî îro va tu sermestî

Tevlî Kurdê xwe jar û bindestî

Lê wê bê gava ku tu serbestî

Soz û peymanek nûka min bestî

Yan tê zû rabî yan tê winda bî

Kêr bûye agir gihaye hestî

Bere em xwediyê petrol û zêran

Em nû ava kin bajarê wêran

Bibin xan û man ev Kurdê dêran

Dezgeh nû çêkin ev dolê şêran
Em bicih bînin rar û zarê xwe
Da em jî bighên heyv û sitêran

Şabeş vî çaxî Barzanî rabû
Mizgîn li her der îro bela bû
Durva azadî va xweş xuya bû
Roja Kurdistan pê re biha bû
Ji zû de Kurdan xewnek didîtin
Me zanî tevde ji bo niha bû

Bijî Kurdistan bijî Barzanî
Xweda pê anî îro erzanî
Tu pir şêrînî Xweda pê zanî
Me da destê wî ceng û rêzanî
Pîlanê dijmin durû dirêjin
Em kirne wêran derdê nezanî.

***

## Hey gelê Kurdê li Sûrî

Hey gelê Kurdê li Sûrî qey çi çêbûye gidî
Sosretek çêbû li ser me min bi çavên xwe didî

Ev çi qird e em ketin dest Be'siyê bê bext û ol
Ew dixwazin ku bi navê şûrevî bistênin tol

Renge reng zorê li Kurdan ew dikin roj û şevê
Kurd dikin birçî û tazî her ji ber wa narevê

Ev Cizîra ku bi Kurdan bûye ava û tijî
Ev gelê ku xwîn ji laşê wa di Sûrî de rijî

Zariwê Şêrgoh û Yûsif ê ku Sûrî çêkirin
Ê di ber ola Muhemed û gede da serjê kirin

Ê berî her kes di Sûrî dewletek ava kirin
Ê ku Qur'an û nivîştê ol li ser çava kirin

Ê kirin cenga Mixûl û Teter û Teymûriyan
Ê li Sûrî kon didanîn ber ber çem û deşt û çiyan

Ê ku Osmanî kirin der ê kirin cenga Firing
Ê ku sînga xwe di Sûrî dane ber top û tifing

Ê kirin aza ziman û şop û nîşanê 'ereb
Ê kirin ferman li Misr û Yemen û Şam û Heleb

Ê wekî Mewlana Xalid, Kurd Elî, Şewqî biner
Wan di rabûra 'ereb de pir kirin halan û ger

Tevlî van tişta ji Kurdan hê dibin dilkîn û bîz
Hê dibên Kurd in biyanî pir kirin bê nav û fîz

Ew bi Kurdan her dilîzin wa dikin hov û reben
Gundê Kurdan tev sitandin wan bi pîlan û bi fen

Ew di çavên dijminek pîs her li Kurdan dinêrin

Ew dibêjin ka gelê Kurd wê bi çi rengî herin

Sed hezar navê me Kurdan wa ji nû winda kirin
Wan bi zarê xwe guhartin nav li her gunda kirin

Gund ji axê me sitendin da bidin Kurdê  xizan
Lê nedan keskî ji Kurdan tevde xwarin wek dizan

Xaniyê Kurdan dixînin da ji Sûrî derkevin
Hê li cîhanê dibakin ku hemû kes wek hev in

Nan û xwarin tev kirin dest Be'siyê zor û nebaş
Kes ji Kurdan hew dikarî barekî bavêjî aş

Tişt ji bo Kurdan bihane lê ji xwer erzan dikin
Qenciya pir bi neyar û dijminê Barzan dikin

Bes ji bo Kurdan xwe xistin bendê al û şorevî
Hestiyê Kurdan bihatin wan bi navê wekhevî

Kar ji dest Kurdan diderxin wan dikin dil û şivan
Ew bi dan û qadê Kurdan her dikin kêf û civan

Hem dikin bênin Cizîrê ew ji dûr êlên ereb
Das bikin talan û kuştin hên bikin Be'sî kezeb

Ev ji cîhanê kesî kir ka ji rabûrê bipirs
Her li îro ava û roder dewletê pir hûr û girs

Heyf li wa yê ku dibêjin em diçin ser asîman
Lê nizanin bê çi agir hatiye dîvê cîhan.

***

## Bajarê (Şeqlawe)

Palek bilind gelekî xweş e
Tev şîn û darê rûgeş e
Jêrî ewar daran reş e
Dighên hev heft û şeş e

Her darekê sê sed gulî
Xox û bîhok û xulxulî
Di nav de naçî yek tilî
Ava pelan çêkir şilî

Sed rengê dara lê civîn
Giya di bin de wek livîn
Sêv û hejîrê hinguvîn
Danî li dil derd û evîn

Avan di nav de xumxum e
Ba lêdixî her gumgum e

Filqek ji gûza xweş kum e
Kaş û newal û dimdim e

Tavik didî darê bilind
Şewqê dida burcê li gund
Mîna çira û mûm û find
Min hê nedî wek wî li Hind

Lê bûne dam cobar û cok
Kevyê ewan tev gangilok
Bûkê gula mestir ji gok
Jê difirîn çûk û kevok

Darek li darê bû siwar
Hin radibin hin têne xwar
Gulyaz û hincas û hinar
Hîndiş dibin ê dîn û har

Her dar di bakî zû werin

Em jêr û jor tevde ber in

Tirş û miz û şor û zer in

Kî bê bixwî em bêder in

Her lib ji sêv û hêgiyan

Dagirtiye rengê piyan

Gava tu rûnê ber siyan

Nêzîk dibin ser balgiyan

Tîrêj li cihna têne jêr

Hew nas dikî tu wan ji zêr

Ka ew kesê berz û dilêr

Ku zû ji wî xweş bûye têr

Her tişt di vî baxî pir in

Jê diweşin digindirin

Hin jê gihane hin çir in

Ba lê dixî ji difirin

Nîn in wekî vî der cîhan

Tevlî ku şîn bû der çiyan

Fêhtîne ji baxê deman

Tevlî ku can lê bûn Xwedan

Binya wî deşt û zêrzewat

Jora wî zozan û kelat

Bakur ewî ceng û şewat

Lewra dikî kêf û tewat

Şeqlawe ev bû yan Buhişt

Hewlêr xuya bû bû li pişt

Rastî newal e ya nevişt

Xwedyê wî Kurd e yan surişt

Havîngeha şêra ye ew

Lê kom dibin qîzê bedew

Qebqeb dikin lê qaz û kew

Yek ser dixin çavên te xew

Pala bilind gazîn meke
Hişyar bibe çavan veke
Gulyê xwe yî tarî şeke
Xwe li ber neyaran perdeke

Çêbû ji bo te hêvî ye
Tu xweş dizanî bê kî ye
Gerçî neyar tu girtî ye
Paşî tu mêvanê wî ye

Ew dilberê te her hebî
Yek car ji te winda nebî
Ta ew li ber bendê te bî
Tu xanim û ew paşe bî.

***

# Civîna gundê Cirmiz

### Gundê 'erebê (Teya) ji bo bijartinê

Min bihîst tiştek li Sûrî em ji darê de ketin
Ew li der yek dewletê lê ew li vir du dewlet in

Yek ji wan Şam e, heta dighê kenarê ber Ferat
Ya diwem gundê Teya ye, li Cizîra Rohilat

Serwerê Şamê çi bêjî yê li Cirmiz nadî pey
Zor li ser Kurdan dibarî kes ji wa nabêjî qey

Ê li wan guhdar dibî pêşî dibê pir bedewî
Lê çi peymanê didin sûndê dixwin tev derewin

Tevger û xapê ewan tevde ji bo Kurdê me ne
Em hemû Kurdê Cizîrê hew li wan pir ewle ne

Vaye pazdeh sal bihûrîn Kurd hemû berdane hev
Her xwedî gund û xwedî cota ji ber hev kirne rêv

Wan berê gotin heçî be'sî xizan û karker in
Hem ji bo zor û xwedî gunda neyar û hember in

Ê nezan û Kurd û 'ereb tevde kirin rêza xwe de
Lê di dil de her ev e Kurdan bixin gor û hede

Qad nedan Kurdê   xizan da ku 'ereb bênin ji dûr
Ew dikin Kurdan bikin winda hemû axa û hûr

Tevde bûn ageh ku Be'sî bo teva bûne bi kîn
Bûn bira tevde ji Be'sî tître bûn jê bûne dîn

Tev dibên axa meye ma wê 'ereb bona çi bên
Ev Cizîr vaye ji pêşîne ji Kurdan bûye şên

Kes ji wa navê 'ereb bêne Cizîrê şer bi kîn

Da hin û hin vî gelê Kurd ji Cizîrê der bikin

Piştî ku hêvî nehiştin ji xizan û karkera
Hêvî dan alî xwedî gund û xulam û serwera

Ew di pêşî bûne Rûsî bûne benda şûrevî
Lê di îro bo Emêrka ew ji axa narevî

Hê ji nû Be'sî dixwazin ku xwedî gundê berê
Dest bidin wan da milê wan ji milê Kurdan derê

Îro Cirmiz kirne paytext key û axa lê civîn
Pez gurandin ça gerandin radixistin pir livîn

Be'siyê ku şûrevî bûn,  bûne axa û keye
Ev durûtî qey durist e ka li kî warî heye

Ew li Cirmiz tev civandin bû hewar û xirecir
Da bibêjin em divên komê 'ereb rûnin li vir

Serwerên êlê Cizîrê tev pepûk û reben in
Tev dizanin hûn neyar in hûn bi wana dikenin

Ger bibêjin ber 'ereb bên ya nebêjin qey çi ye?!
Ji gelê Kurd ê li pey wa ka bibêjin bê kiye?!

Karê ku Şam û Hesîka hew dikarî bêne ser
Gundê Cirmiz kengî karî ji riya wî bête der

Axê Kurdan tevde Kurd in ew li pey Kurdê xwe ne
Ê wekî Ferhan û Mîzer tev bi dil ne l' pey we ne

Tev divên qadê bidin van mal û cotkarê Cizîr
Ê di vir de bûne peyda lê mirin lê bûne pîr

Kurd hemû kom û civat in çû dema axê mezin
Ê di zindana dirazin Kurd li pey wa dibezin

Komiza Kurdan çi bêjî tev xebatkarê ewan

Ger li pey wa hûn nerazin kar û bar nabin rewan

Her bijî Kurdê   ji bo vê yek şeqamek xwaribî

Ê ku hê jî pêve rabî ew li gorî karibî.

***

## Dostê rast kes nîne

Hey hewar dostê me kî ne kî li cîhanê heye
Ê ku bê hûn jî mirov in ev cih û warê we ye

Ev cîhan îro du bend in berberî hev radikin
Hin bi wan û hin bi wan in yek yeka aza dibin

Hin diçin alê Emrêka yê ku pêşî dewlet in
Hin diçin paxilê Rûsa yê bi nav û rûmet in

Hin dibên em dadîxwaz in da bikin zor û sitem
Ew dibin dostê Emrêka her wekî tirk û 'ecem

Hin divên em şûrevî ne lê bi dev ne ji kezeb
Rûs dibin qirdik ji wan re her wekî Zeng û 'ereb

Tev dixwin mafê mirova yek didî destê yekî
Kî bikî zorê ewê dî wê veşêrî perdekî

Pêşevan û peyrewê wan tev gur in em nasdikin
Geh bi zor û geh bi xapa ew bi hev derbas dikin

Wê dema ku dilgiran bin ji Emrêka yan ji Rûs
Rast û çep têne veşartin nû dikin bona xwe lûs

Wê dema ku zor li wa tê bê fedî têne gileh
Piştî van tişta teva jî bo yekî nabî guneh

Ev çima ku bûne dewlet hê berî çend salekî
Her wekî karek nemaye hew divên ew palekî

Ma gelo bindest nemane rast li cîhana fireh?
Qey gelê hejar nemane tevde aza bûn di ceh

Hûn hemî zanin ne rast e pir gelê bindest hene
Lê nema zanin çilo kin bê dev û bin perde ne

Ya jî hûn poşman xuya ne li hemî tiştê berê
Hûn divên cîhan ji bo we ber bi piştê vegerî

Yan dema azadiyê çû kes nema aza dibî
Ê ku sax ew ma bi saxî yê ku mir hew radibî

Kes wekî Kurdan ti nîne ku bi milyona hebin
Tevlî ku qenc û xuya ne ew bi azadî nebin

Em nema zanin çilo kin her emê rengê xwe bin
Rast û çep herdû nebaş in hin hene dostê me bin

Em herin çep dijminê me tev diçin cem Rohilat
Rûs dibî dostê neyara em dimênin gêj û mat

Em herin alê Emrêka ew ji ber me direvin
Çimku tirk û Emerêka tevlî Parîs lihevin

Dewletê Îslamê tevde dijminê canê me ne
Lewra ku axa me Kurdan dest ewan de perçe ne

Fileh in pir dewletê dî ew divên em şer bikin
Da misilman bibne dijmin tevde hev bêper bikin

Dijminê me yek tenê ba me dikaribû bi wan
Em çikin pê şeş neyar in em dibin kêmî ewan

Ingilîz û hem Ferensa, em çima bêpar kirin
Tirk û firs, 'erebê vir, li me Kurdan da har kirin

Ma çima em kirne çar qet ne kirin perçek tenê
Lewra Kurdistan dibêjî hey hewar e rebenê

Hin jî tirk û firs dibêjin Inglîz pir gawir e
Hem 'ereb her dem dibêjin ku Ferans agir e

Ma Firing û Ingilîza çi ji wan kirye gelo?
Ma welatê Kurd nedan wan nekirin tert û kelo

Tirk û firs û 'ereb û Rûs, Ingilîz ta Firing
Tev yek in bona me Kurdan radijin şûr û kuling

Qençiya keskî nema ye kî ne başî birewî
Em ji tirsa wan dibijin tu heval û bedewî

Paşiya tişta xuya ye em dikin hêvî ji wî
Pir bikin doz û xebatê guh nedin tiştê çiwî

Vaye Barzanî xuya ye zanekî  çîhanî ye
Muhr û hîmek bo me danî çê dikî azadî ye

Ingilîz û hem Ferensa nû li me poşman dibin
Nû dizanin Kurd siza neem weha guman dibin

Ew dizanin em ji tirk û 'ereba pir çêtir in
Em ji sed warê cîhanê bi jimarî bêhtir in

Em dikin doz û xebatê hem bi saya Mustefa
Wê bibin dostê me Kurdan dewletê qenc bi refa

Dê werê roja me Kurdan her wekî dost û neyar
Lewra Kurdê   mal û der ve tevde bûn jîr û şiyar.

***

# Be'sî ji bo 'ereb nebaş e

## (Be'sî ji bo çi çêbûn)

Be'sî ji bo çi çêbûn
Çima wilo ji rê bûn

Hewqa nivişt û Qur'an
Hewqa mirovê hozan

Ji bo ('Efleq) diberdin
Çima wilo di derd in

Ev zaneyê wa pir in
Çima wilo bigirin

Piştî Xwedê ku da wa
Sed reng û beng û awa

Li cem yek filehê pîs

Ji bo xwe çêdikin lîs

Vî 'Efleqê bê biha
Be'sîtî çêkir niha

Goya 'ereb nema bûn
Bi Be'siya xuya bûn

Hey 'Efleqê bê edeb
Kengî tu dighê 'ereb

Kî dizanî tu'j ku ye
Hezar salan çi bûye

Tû filehek bê binî
Tû ji 'ereb ne hinî

Gelo bavê te kî ye?
Bawer im tu bêjî ye

Goya tu pêxember î

Tû filehê ser ker î

Ev tiştek dûrî te ye

Li pişt hezar perde ye

Çilo 'ereb dixapin

Dibêjin em du ap in

Ma qey 'ereb nema ne

Hûn bi 'Efleq gihane

Heşkerî ew gawir e

Ji bo me ew agir e

Ê li pey nezan in

Dil gawir û xizan in

Tû dijminê teva ye

Newêrekê şeva ye

Misilman berdane hev
Hin ji hina dikin rev

Misilmana dikin reş
Suryaniya dikin xweş

Kî xwe bikî ji Be'sî
Di çavên wî de dasî

Xweş me jê bikî dûr
Bi sed cihê pirî kûr

Be's xeyidîn ji Yezdan
Wan tiliyê xwe gez dan

Çikû 'Efleq dibêjî
Bi kurtî û dirêjî

'Ereb çi yê baş û pîs

Reş û çi gewr û çi sîs

Divê tenê ew hebin

Di cîhanê kes nebin

Her ol û al û zeman

Divê bibî yê ewan

Tev li 'Efleq dinerin

Li ber wî tev bê perin

Heger hebî li wan keys

Tev dibin (Imreil Qeys)

Islamê xweş hilênî

Ayaniyê xwe bênî

Da çêliyê xwe pirkî

Misilmanê xwe qirkî

Wê tirk û firs û kurda
Belakî vir de wir da

Di pêşî Kurd û îran
Lewra ev in ê cîran

Ev in ev ê didin har
Divê bibin tar û mar

Dizî bi wan dikenin
Agir li wan dijenin

'Efleq serê xwe rakî
Bi armanca xwe bakî

Çê bikî cîhanek nû
Bêjî dema 'ereb çû

'Ereb Suryan deranîn

Me jî 'ereb hilanîn

Wa em kuştin bi germî

Me ew kuştin bi nermî

Wê 'ereba veşêrî

Welat bixwî bi têrî

Da wan bihêlî tenê

Dest bavêjî ser çenê

Xwedê çavên te derxî

Nehêlî tu bi serxî

Pir li 'ereb bi kîn in

Divên ku wa nebînin

Wan dihêlin bê heval

Ji bo bibin wek qepal

Kes dijminê wa nîne
Tenê ev 'Efleqî ne

Xwe dikin xwîngirê wa
Da bibin şûngirê wa

'Yerub û 'urb û 'ereb
Ji dîn diçin deh celeb

Bûn dijminê yê Ecem
Dibê ev in bûn kelem

Divê tev bêne kuştin
Wan em li paş dihiştin

Nemînin Kurd û 'ereb
Jê re bin Şam û Heleb

Ji Qur'anê digazin

Li pey 'Efleq dibazin

Dibên ji bo çi Qur'an

Ne gotiye ku 'urban

Çêtirê her gelan e

Gulê li ser pelan e

Lew dibêjin Muhemmed

Hew ji me re dikî ked

Qur'an gelek bû kevin

Emê ji ber birevin

Emê ji nû xwe pêk in

Yekî li gor xwe çêkin

Ji bo ji nû qad û nan

Seraser bêne berdan

Muhemmed bo wan bes e

Ev 'Efleqo çi kes e

Ka gotinê pêxember

Hey Be'siyê gelemper

Digo yek in misilman

Çi Hîcaz û çi Îran

Kî qenc e ew bilind e

'Ereb tenê ne rind e

Ewî serê we hilda

We nû çavên xwe kil da

Heyf li wê qenciya wî

Tevî wê renciya wî

Ka we çi jê hilanî
Kî ji we bû xuyanî

Emê herin cem Xweda
Bê kî dimênî geda

Ne hûn pesnê xwe bêjin
Çil derewî birêjin

Qencî bi zarê we ye
Lê ne ji karê we ye

'Efleq çi ye we da pişt
Baweriya 'ereb kuşt

Hûn vegerîn li xaça
Da keç bidin we maça

Wî bi navê pismamî

Hîn tev kirin ji Samî

Ji Îslam û Filetî
Ji nû we girt milletî

Samî ji we'r bûye çek
Rûs û 'ereb bûne yek

Yahûd û Suryan û Rûm
Tevan 'ereb kirne bûm

Wekî hûn bûne Samî
Ev şerê wan ne kamî

Hûn ra dikin bi hîndaz
Li Yehûdê belengaz

Ew jî hinek ji Sam in
Ji bo we lawê Am in

Ne Îsa û ne Mûsa

Ne agirê Mecûsa

Tevî ewan Muhemmed

We tev kirin binê hed

Hûn vegerîn li Telmûd

Hûn ketin şûna Yehûd

Mîna Yehûdê berê

Nema dikin bawerê

Bi yek rêza nû ola

Bidin ser xweş li çola

Li ser devê riyê şaş

'Ereb dibin kurê baş

Ji bo Xwedakî derew

Mîşêl 'ereb kirne xew

Ev 'Efleqê bê mejî
Hînav li wî bû rijî

Nekir ji bo xwe tiştek
Ne xwendin û nivîştek

Şev û ro aware ye
Bê heval û çare ye

'Ereb nema didin dû
Nema zanî herî kû

Xwedê ji te'r ne hêlî
Nebin li pey te çêlî

'Efleq bes e çi bûye
Çi hindîşek bi gû ye

Hey bê mejî veger paş

Tu hew karî herî aş

Her Xwedê wek te nakî

Hezar salî tu bakî

Dûr bim ji vê riya te

Ne rûnim ber siya te

Heta ku em dikarin

Nifir li wî dibarin

Xwedê jîna te kinkî

Laşê te ser di binkî.

***

## Em çilo çêbûn!
## (Ka gelo kes heye rastî ku bizanî)?!

Ma gelo kes heye rastî bizanî neguman e?
Ev heyîna jîn û laşê wî çi ye bona çi ye?!
Va bi rastî ez dibêjim pê nizanim heşkerî
Ê bi rastî bidî bersiv bila bê kanî kî ye?!
Ma gelo ev qad û esman ev sitêr bona çi ye?
Ka ji kengî bûne peyda kî ji bo wan xwedî ye?!
Ev çi ax û ev çi av in ev çi dar û çi ber in?!
Ev çi êvar û çi tarî çi ro û ronahî ye?!
Ev çi çêbûn û mezinbûn çima çêbûye mirov?!
Ev çi derman û çi jehr in ev çi sar û germî ye?!
Ev çi girs û ev çi hûr in ev çi mêş û pirpirok?!
Ev çi kurm û ev çi kêz in ev çi mar û masî ye?!
Ev çi çûk û çi teba ne çi dewar û çi pez in?!
Ev çi şêr û çi cenawer ev çi hirç û kovî ye?!
Ev çi mal û ev çi zaro ev çi mêr û çi jin in?!
Ev çi pîr û çi ciwan in çi reş û hem sipî ye?!

Ev çi xwarin çi vexwarin ev çi şêrîn û çi tal?!
Ev çi can û ev çi xwîn e ev çi goşt û hestî ye?!
Ev çi dost û çi dijmin çi evîn û berberî ye?!
Ev çi zirt û çi sixêf in ev çi naz û behrî ye?!
Ev çi xap û çi pîlan in ev çi tinaz û ken in?!
Ev çi zor û kotekî ne ev çi kîn û fedî ye?!
Ev çi çirkîn û delal in çi neyar û dilber in?!
Ev çi saz û çi hawar in çi kenîn û girî ye?!
Ev çi xurt û çi qels in ev çi kurt û çi dirêj e?!
Çi xizanî çi ye mewdan ev çi têr û birçî ye?!
Ev çi nerm û ev çi hişk e çi ziwa û çi şil e?!
Ev çi xwînşêrîn û nazik bo çi ev xwîntalî ye?!
Ev çi renc e çi hesan e li bêtar û nexweşî?!
Ev çi şêwe çi ziman in ev çi bav û çi dê ye?!
Bo çi ye ev çûn û hatin ev xebat û kefteleft!
Bo çi ye kuştin û lêdan bo çi ev bêbextî ye?!
Ev çi tevin û çi teşî ne dezgeh û rengî bedew?!
Ev çi zêr û çi hevirmêş ev çi xisr û benî ye?!
Ev çi heyf û ev çi tol in ev çi doz û pey de çûn?!

Ev çi ol û çi welat in çi ceng û aşîtî ye?!

Ev çi bajar û çi gund in ev çi sah û leşker in?!

Ev çi Roava û ro der ev çi bend û hewî ye?!

Ev çi kom û çi civat in çi dewlet êl û bilûk?!

Bo çine ev çek û posat çi pingar û gemî ye?!

Ev çi dûr û çi ye nêzîk ev çi rast û çi çep in?!

Çi biyanî çi mirov in çi çi ye ev çi kî ye?!

Ev çi çûna heyv û berces ev gera ser asîman?!

Ev çi sînor û tixûb in ev çi text û kursî ye?!

Ev çi bîr û bawerî ne çi guh û çav û dev in?!

Çi Buhişt û dojeh in ev çi cîhana paşî ye?!

Ev çi mizgeft û keneşt in çi tîpistan û sera?!

Ev çi rih û ev çi şaş inev çi laşê tazî ye?!

Ev çi Tewrat û çi Incîl in ev çi Qur'an û Zebûr?!

Ev mirov û zanewer ku hiş û hîndiş kanî ye

Ev çi tirk û ev çi faris ev çi Kurd û 'ereb in?!

Ev çi Îslam û Mesîh in çi Yehûd û Bûzî ye?!

Ev çi pirtûk û çi xîz in ev çi xewn û caziwe?!

Ev çi mizgîn û çi tirs in ev çi peyxemberî ye?!

Ev çi baş û ev çi pîs in ev çi çift û bêqudoş?!
Ev çi rêzan û weqûf in sosret û kes nedî ye?!
Ev çi rojî û limêj in çi puristê renge reng?!
Ev çi xwînrêjî û mestî çi mey û tolazî ye?!
Kî li van tişta dipirsî bil ji xwedyê can û hiş?!
Lê belê wa jî nikarin bigihînin binî ye
Pir kesan gotin dirêj kir da heyînê zanibin
Her yekî gotiye tiştek wî li gor dil gotiye
Her yekî bawer dikir ku rastiyek wî peyde kir
Tû ji van gotina her dem neyarê yê dî ye
Hê ji cîhan keskî tiştek xweş bi rastî nas nekir
Lê ji nav wa gotina hin bêguman hey rastî ye
Hiş heye bo her mirova yê niha çêtir heye
Kes nikarî bê ez im dûr im ji her kêmasî ye
Lê ji vir pê de heye binya heyînê nas bikin
Û heye hew nas bikin ev tiştekî pir berze ye
Dil ji bêjî der bikin da em bibênin rastî ye
Gotina hevdû bikin bê ka dilê rast ê kî ye?
Ez dibêjim ev cîhan tiştek di piştî wê heye

Teqreq û ev hingedeng kengî dibin bêxwedî ye
Ev xir û cir ger û govend ne ji bo îro heye
Ne hinek çêbûne tevde ne jî kêf û larî ye
Ne beradayî dizanim ev hemû hatin cîhan
Ê ku ew anîn hebûnê ew dikî wan xwelî ye
Wî ji bo tiştekî çêkir tiştekî pir mezin e
Lê belê nîne kesê ku hê bi wî bîrbirî ye
Ev cîhan pir sosret e wek Sînoma tên û diçin
Ev ji bo tiştekî hêja xewn û ayîn û sî ye.

***

## Bîreweriya min

Mi dî carek ji nişka bûrewer bûme li cîhan in
Dê û bav û xwedyê min tev dibêjin em misilman in

Seraser her dem û roja li yek malê me dî qîr in
Digotin vaye mir xort û keç û mêr û jin û pîr in

Mi pir cara dikir pirs û mi go bo çi wilo bûne
Çima ew çê dibin peyde diçin ma ew çilo çûne

Digotin va nivîsîne di nav xîzê niviştê de
Misilman ku dema dimrin dikevne nîv Buhiştê de

Mi go kî tê wilo cana dikî winda ji van laşa
Di mala de di kara de di av û gund û hem asa

Digotin ew furişt in tên bi çava her xuya nabin
Heger em wan bibînin dê wekî balindeya rabin

Mi jî bawer nekir gelekî ku ev rastî wilo zanin
Ejî mame wilo mat û wekî ê dil bi kovan in

Mij jî kara gelek tişta dikir ku ez xwe nû pê kim
Nivîsar û nivişt û xanî û tiştê ji dil çêkim

Mi dî laşê mi bû germ û li ber çavên mi çêbû zer
Mi go vêga ezê bimrim niha canê mi wê bê der

Mi dî ku ez belengaz im hiner çûye wekî gêj im
Bi çavên xwe nedî min bi rastî jê re ku bêjim

Li cem xwe min mirin kir wek mirovek wa ji mir bêjî
Evan peyvê ku ez bêjim bidim ez bersiva wê jî

Ew: Ewê got wer ciwanmêro bibe der tu ji cîhanê
Gelo carek tu nabî têr ji kêf û ceng û dîlanê?

Ez: Mi got rokê mi şahî dî mi deh rojê bi kul xwarin

Tu nabînî du-sê parê me birçî ne û hejar in

Ew: Kuro ma tê ji nû çibkî wekî pêşî tu namînî
Heger tu baş xwedî hiş bî tu qîma xwe bi min tînî

Ez: Gidî ber ez bimînim sax niyazê min gelek mane
Heye ku ez ji dil derxim hinek êş û kul û jan e

Ew: birayê min li cîhanê ti carî jankuta nabin
Çi hejar û evîndar bin çi serdest û çi paşa bin

Ez: Eger tu min bihêlî sax li te wê çi ziyan çê bî
Kesê hat û te winda kir heger çi ew kurê kê bî

Ew: wekî ku hin bimênin sax çima yê dî nebin jîndar
Ezê tevde bikim wek hev ewan tevde verêkim xwar

Ez: Hinek pîs û sitemkar in belê hin jê çi hêja ne
Evê hêja çilo wek wa çirûk û hem qirêja ne

Ew: Heger başa nebin çibkim di gel pîsa di vê jînê
Li wan dê pir bikin zorê ji wana pir bixwin kînê

Ez: De ka tu min nebe îro ji te ez gazinê nakim
Li min kî bî bikî zorê ezê hingî xwe wek wa kim

Ew: Nizanim tu çiqas sala dixwazî te bihêlim sax
Heta ko tu bibî dilsar bi kêfa xwe ji cax û bax

Ez: Divê tu min bihêlî sax  heta cîhan hebî ava
Ezê çibkim ji wê jîna bi sal û kêlî û gava

Ew: Çi karê te heye hewq li cîhanê tu jîndar bî
Du sed sal xweş bicih tînin çi kar û îş û bazarî

Ez: Berî min pir mirov rabûn sedê salan kirin derbas
Ewan tiştek ji cîhanê nezanin û mirin pêxwas

Ew: Çi tiştê xweş li cîhanê hebî ka tu bide bersiv

Çima hewqa bi te cîhan dibî şêrîn wekî hinguv

Ez: Heger cîhan bibî xweşî nemînî tê de dijwarê
Gelek rind û gelek xweş e di hingî de were darî

Ew: Çilo cîhan wilo xweştê tevî ku ew cihê derd e
Çilo tê wê bikî bê jan çi ye ev zû xwe jê berde?!

Ez: Emê çibkin ji vê jînê bi çend sala nehêja ye
Wekî zindanekê xwarin li ber bê hoş û gêja ye

Ew: Tu bimrî tê li pey mirin kurt e ne bê pişt e
Cîhanek dî ewê çê bî ji kêf û şahiyê mişt e

Ez: Niha ev peyv ji kê derbû ji kengî ve wilo gotin
Dibêjin ê nekî bawer di hingî wê werê sotin

Ew: Herê rast e wilo gotin mirovê baş bi vê rabûn
Kesê bawer kir kuştin xwedî bawer li pay wa bûn

Ez: Kesê baş ku wilo gotin ji alî kê bihîstin ev
Hinek winda wilo gotin ewan gotin tenê ser dev

Ew: Dibêjin ku Xwedê bo wan dizî peyvî ji alê jor
Tenê wan dî belê îdî hemî man bêhiş û çavkor

Ez: Wek saxa nekir bawer mirî hê kes ne rabûne
Tenê çawa te kir bawer çilo em bo te şa bûne

Ew: Kesê ku mir hinek hatin li cîhanê kirin peyvek
Ewan gotin me Hêzdan dî di jînê man dem û heyvek

Ew: kesê dimrin ti kes nayê diçin hew tên bi yek carî
Di piştî ew dibin bê can laş û gewde dibin arî

Ew: Nexewe çawa ewan tenha Xwedê dî bê kul û kovan
Belê kesîk nema ew dît didin pey wan wekî hovan

Ez: Gelek tişt hatine gotin belê ev tişt ne asan e

Ji wan bêhtir dibêjim ku ne tenha gotina wan e

Ew: Ji wer gotin ji bo ku hûn bibin derbas ji bêhoşî
Herin ser wê Buhişta jor bibînin hêvî û xweşî

Ez: Wekî wa bî bere Hêzdan evî warî bikî bê kul
Mirin rabî ji cîhanê bibî şahî li gorî dil

Ew: Heçî ev qade namênî çi jan û yek çi şahî bî
Mirin tê wan dikî wek hev ewan tajo kurê kê bî

Ez: Ji saxa pir dibêjin vê bixwe ez pê nema zanim
Yek in sax û mirî tevde li ba min ez li pey wan im

Ez: Wekî saxa nekir bawer mirî hê kes ne rabûne
Tenê çawa te kir bawer çilo em bo te şa bûne

Ez: çima bimrim  di janê de ji nû rabim bikim şahî
Çima wê tariyê çêkin xwe nahêlin dironahî

Ew:Ji te pir hez dikim xorto dixwazim tu di gel min bî
Ji bo min tê bibî mêvan dirêj û yan heger kin bî

Ez: Wekî ku tê ji min hizkî çima tê min bikî bin ax
Heval û dost û yarê min bibêjin wey gidî hey wax

Ew: Gelek dost û hevalê te li ba min wane mêvan in
Dixwazim tu herî cem wan meger bêdeng û pêvan in

Ez: Dizanim ew te xapandin te gelekî mirin rind e
Heta ku te bi hasanî ji ser axê kirin bin de

Ew: Heger dostê te bin rastî divê ku bê li cem wa bî
Çilo dê ew mirî bin tev di warê wan tu her şa bî

Ez: Kesê ku mir teva rake bere em tev li cem hev bin
Bere em tevde ji janê bin bere rojê me yek şev bin

Ew: Mirov pir bûn mirî rabin cîhanê têra teva nekî

Keç û kur çê bibin êdî nema kes karî avakî

Ez: Bere bavê me tev rabin me hew zaro divin îdî
Sitêra em dikin bajar ji bo te em bikin çi dî

Ew: Tu bindestê min î îro ez jî bindest û serjêr im
Xwedakî min heye rastî li ber wîna wekî kêr in

Ez: Te got û min nekir bawer heger rast e bi hasanî
Were canê mirov derxe heçî laşa bibî banî

Ew:Ji bo te min birastî got Xwedê got û mi wek wî kir
Mi ferman her bicih anîne ku min bo we pîsî kir

Ez: çilo Hêzdan dibêjî hûn herin îdî bikin winda
Çilo ba û lehî rabin bikin wêran cih û gunda

Ew: Mirov ku mir çilo bimrî wekî hev tê li ser cana
Heger bimrî di nîv avê heger bimrî li ser bana

Ez: Çima hin jê bilez dimrin  hinek dimrin di êşê de
Birîndar in genî laş in sitembar in di bêşê de

Ew: Ezê îdî xweşik bêjim ez û jînê neyar in her
Çi tiştê jîn bikî peyda li ber wê ez dibim hember

Ez: Gidî bextê te em hûr in me nemrîne sitemkarê
Tu deng nakî hewarê me di roj û hem di êvarê

Ew: Tu jî lawek ji yê jînê bere jîn te biparêzî
Heger ew te neparêzî bixwe tu bê ger û hêz î

Ez: Çima hûn herdû nabin dost ji bo em jî neyên kuştin
Ji cenga we ji kîna we dil û canê me tev xiştin

Ew: Di jînê de tu wî hişdar li xwe pirsê bikin gelkî
Ji bo ku hûn bimînin sax seraqet a hin û pelkî

Ez: Nikarim şape û agir nikarim lerz û bahozê

Nikarim tavik û berfê nikarim tarî û tozê

Ew: Cîhan tevde ji du tişte hebûn û hem nebûn jê ye
Hebûn jîn e nebûn ez bûm tu jî lawê hebûnê ye

Ez: Naxwe tu dijminî rast e nebê Hêzdan dixwazê te
Bi soza min nexapîne mi naskir her niyazê te

Ew: Te naskir ya dilê min de bi keskî tu nedî zanîn
Ditirsim xwe biparêzin bibî serdest neyara jîn

Ez: Ezê bêjim belê çibkim cîhan dagirtî mirovan in
Ew in mêra dikin winda wekî tiştan û şûran in

Ew: Ne ew e jî bin heye carek ev ê heyvê li qadê xim
Evê şewqê bela kim tev ev ê rojê nema pêxim

Ez: Heta em karibin îro emê jîna xwe derbas kin
Heye ku em ji te çêtir te û jînê ji hev nas kin

Ew: Ji nû got va ezê rabim ev ê carê bibim derbas
Tu binvîse hinek tişta li gorî tu bibî pênas

Ez: Mi go mala te ava bî te vê carê di min bûrî
Heye ku zû neçim gorê ji min hinkî bikî dûrî

Ew: Ji hingî ez dikim hûndiş wekî çûkê bi bendê de
Çilo wê kî bidî bersiv herim ka ez bi ser kê de

Ez: Ne îro ji pêşî de kesî bersiv neda min xweş
Ne ez karim ne ew karin bidin zanîn bi dilkî geş

Gelo ka em çilo çêbûn çima çêbûn di bin winda?
Gelo kê gotiye çê bin bidin bersiv gelî rinda?

Gelek tişt hatine gotin belê ez tişt ne hasan e
Ji wan bêhtir dibêjim ku ne tenha gotina wan e.

***

# Cîhan bêkêr e

Cîhan çi dixwazî çima hewqas dikî zorê
Pir tu li ber çavên mi reş bûye mi tu navê

Bo çi dikî rencê li me jaran bi neyarî
Dostê te ti nînin tu nenasî me tu navê

Cîhan sed hezar sal dibihurin tu dinêrî
Rokê te ne pirsî bê çi bûye me tu navê

Jîna me li ser te reş û zor e tu dibênî
Goya tu wî dêka me bi canan me tu navê

Kî karibî yê dî wî ji holê dikî bê par
Zaran dibihîzî tê xwe kerkî me tu navê

Birçî hin dimênin hin seraser geş û têr in
Ev bo te neşerme ka binêre me tu navê

Hin laş dibirêjin nîne avek bo vexwarin
Hin jî  di çema de dileyîzin me tu navê

Hin tazî dimînin di havîn û sir û serma
Û hin bi hevirmêş xwe dipêçin me tu navê

Hin jê li ser qadê vêvirîne bê mitêl in
Ê dî dilivîna diçin xwarê me tu navê

Hin bê cih û xanî her dimînin li dera ne
Hin koçk û serayan hew dixwazin me tu navê

Xwîna hina şêrîn e hemû jin wa dixwazin
Hin bê jin dimînin wilo dimrin me tu navê

Pîrek hene mêrê xwe dibînin bi dilê xwe
Bê mêr hin dimênin di kula de me tu navê

Her yek xwe dixwazî li riwê te bi tenê bî

Ê dî dikî winda ku dikarî me tu navê

Ev kûçik û zûrîk û çi tiştê ku li çola
Birçîne nikarin xwe xwedî kin me tu navê

Ev mar û firok û kêzik û mêşik û moran
Ev kurm û çivîkê bê xebat in me tu navê

Kî hevdû cudakî eger bimrî kî xwe derxî
Kengî tu dibêjî çilo çêbû me tu navê

Hin dar û giyayan em dibînin çi bi av in
Hin dibin ziwa, hişk û  zirav in me tu navê

Arê te hinek sar in wekî berf û qeşa ne
Hin germ û bi qûm in wekî agir me tu navê

Hin goh in bilind in ew seraser dikin difrê
Hin kêm û hejar in di cihê kûr me tu navê

Hin şîn û bihar in germ û serî wekî hevdû
Hin latê xwerû hişk û ziwa ne me tu navê

Hin warê te agir dikevin wa dibin arî
Hin cih di avê de diçin xwarê me tu navê

Hin cih dibin ava gund û bajar dibin wêran
Hin çolê beyar in dibin bajar me tu navê

Em tên û diçin jî em nizanin çilo çêbû
Em tên û diçin jî em nizanin çilo çêbû.

***

## Siwarê Kurdan hatin şer

Va siwarê Kurd û Kurdistanê hatin bûne ref
Lew li ber çavên neyaran dar û ber tev bûne xef
Pêşberî topa dirabin cendekê bê dest û ser
Xwîn wekî derya bi pêl in ji kelê tev bûne kef
Hing û dengê van firokan ket cihê dîlan û def
Laş li ber ava dibûrin pir tijîbûn gêr û qef
Hey hevalê min netirsin leşkerê Kurdan pir in
Tû li hawîr bike seyrê pir xuya bûne selef
Xanima îro hilanîn perde û doşîn û şef
Li ser û gûz û çinara sorgulî bûne kelef
Bûne goristana dijmin deşt û qadê vî cihî
Pir dibin axê de mane ew diranê weke sedef.

***

# Kurd ji cengê natirsin

Kurdê me tu baz û gerd û pêhlewan î
Pey vî şerê dijmin her dem tu rewan î

Her dem tu li ser wa serbestî dirabî
Nahêlî bedew ku razî bi te şa bî

Hawîrê welatî tev çal û şikeft in
Dijmin çi dibêjî zanim hemû keftin

Ser pozê diyara talan û devî ne
Lewra ku li ser wan dijmin bi evîn e

Xortê wekî Restem jîr û qehreman e
Dijmin her ji ber wa bêzar û guman e

Sosret ez dibînim hewqasî tu germ î
Çawa li ber dijmin îro bixwe nerm î

Wek şêra herin ser kolanê kelata
Dijmin wekî goka bavêjin ferata

Çogan bide qadê sîngê bike mertal
Laşan bifirîne konan bike qelpala

Pişta bide latan pêşî bide ser wan
Lûlê gulerêjan nîşan bike ser wan

Wek tavê biharê topan bixuşîn in
Rengê pelê daran laşan biweşîn in

Bîra xwe de bînin bavê xwe yî Restem
Da laş û dil û can yekser bibî Hestem

Pêşya xwe bikolin kozik û çeper û erx
Çêkin ji neyara lod û keleh û kerx

Ser şax û zinaran rakin mij û moran
Ber bêne temaşa cenga we ji goran

Kurdo tu ji pêşî hemyarê zinar î
Dijmin çi diwêrî kengî bi te karî

Pişta te ye pola tu îro netirs e
Hûr hûr li nejadê Kurdan bipirse

Tê hingî bizanî şana te çi kes bû
Da xweş tu bizanî dijmin çi teres bû

Kurdo tu bizane kêmî li te nabî
Dijmin ji kevin de bo Kurd e di ta bî

Şûrê xwe ji kalan serbestî derînin
Rast û çep û Başûr cengê bigerînin

Ser jorê neyaran şûran bihejînin
Xwîna kesê şerxwaz bêdil birjînin

Leşker werê cengê qolan bike lek lek
Wek Dicle û Xabûr dijmin bide ber şek

Gindir bike zirxî perçe bike topan
Goran vewejêr e şehran bibe xopan

Balafirê pola daxîn bibuhêj e
Hasin bike agir daran bibirêj e

Piştî te çiya girt dakev were xwarê
Rakin li neyara qîrîn û hewara

Da hingî ji nû ve dijmin bi dizîka
Bênî bikî navcî Rûs û Emerîka

Da her kes bizanî kî mêr û siza ye
Hember çek û agir kî kêm û beza ye

Wê hingî xuya bî ku bûye perîşan
Kî babet û rind e bo dewlet û nîşan

Bawer bike cîhan em baş û mirov in
Îro tu dizanî dijmin bê çi hov in

Bextê me çi reş bû para me ye kuştin
Mêrê xwe yî hêja goman me nehiştin

Tiştê ku me gotin dijmin pê dizanî
Wê bo me demek bê ku rabî xizanî

Dijmin tu bizane em dê her weha bin
Ta em di Kurdistan serbest û biha bin

Ta Kurd nebî dewlet ma kengî dirazin
Tiştek bê serê we rakin ji xwe gazin

Herdû emê bimrin yan dê Kurd eza bî
Tenha tu eza bî her tê di geza bî

Gotin bes e dijmin derdê me giran e
Laşê me ji qera tev şûnê diran e.

***

## Kurdên bi kolos ketine cengê

Kurd bi kolos û kum, xencer û kesrewan
Wek pilingê sivik pêl bi pêl bû rewan
Bûne lek zariwê Restemê pêhlewan
Qol bi qol hilkişîn ser çiyan wek kewan
Ketne cenga welat hew dizanin xewan
Hindera Kurd  dikî kes nedî wek ewan
Can didin xwîn didin xort û merdê ciwan

Xumxuma zirxiyan gumguma hilweşîn
Har dikin can û dil radikin ew miwan

Sed sedan xort û merd ê peler herne pêş
Kû neyar bûne ser cendekan bikne kêş
Em nema nas dikin kuştin û şer û êş
Her kenar bûne şer balafir bûne mêş
Qir bikin dijmina wan ji vir bikne rêş
Merd û jin bo welat îro tev bûne gêş

Hew didin bo neyar terx û talan û bêş

Çerx û pêla felek zîvirî hey bira
Aş giha yê berê kar nema bo gerêş

Awirê tûj bidin her kenarê welat
Cih nema bo neyar ketne goh û kelat
Nexne destê ewan Agirî û hem Xelat
Cih nedin kuştin û qîr û deng û şewat
Hêrzemand herne şer dil geş û pir şewat
Asîman bikne toz hûr bikin bend û lat
Hêz û bendê neyar tev ji Kurd bûne mat

Xortê Kurd aferîn xweş neyar perçe kir
Piştî ceng û şeran vaye roja me hat.

***

## Partiya Kurdê Sûriyê

Partiya Kurdê  li Sûrî xwîn dirêjim ber te de
Xortê nû dem dest û dawê Partiya Kurd bernede
Rohniya roja welat e ew di vî çaxê me de
Ew tenê dê bona Kurdan çê bikî kar û ked e

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat

Tu'j xebata xort û merdan hatiye rûkê cîhan
Tû bi destek hatî danîn pir bi hîndişî gihan
Bo te hîmek ta ku çêbû pêre çû xwîn û jiyan
Xortê hêja dikne gorî bo te her bav û diyan

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat
Kêl û armanca te îro bo welat azadî ye
Da bibînin em di vir de serxwebûn û şadî ye

Kurd e herdem dijminê şer çimkû lawê Madî ye
Can didin dost û hevala tev ji ber dil sadî ye

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat

Dê bi sala te birabin ev gelê Kurd û 'ereb
Zarê kurdî dê xuya bî Bakurê Dêr û Heleb
Pêşî dijmin dê bikin şer Kurd ji bo kêfa kezeb
Qîzê Sûrî dê bipoşin zergeş û al û qeseb

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat

Lawê Qehtan lawê Madî tev di Sûriyê de yek in
Dijminê wan her dixwazin wan ji hevdû perçe kin
Hem dixwazin şopê Kurdan ê kevin zû berze kin
Da ji bo Ku em li hev xin ew bi dil kêfa xwe kin

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat

Pêşewa yê Partiya Kurd xwendevan û zanewer
Kî naxwazî doza Kurdan wê bi zorê bibne ser
Kî bi rindî bê me Kurdan em bi rindî têne ber
Her bijî ev Partiya Kurd ew ji bo min bû çeper

Partiya min rêber e her Partiya min rêber e
Xweş gotiye rêber im bo her dem û gavên welat.

***

## Kurd ji pêşî de qehreman e

Ev gelê Kurd qehreman e serfirazî her divê
Şêr û merd û pêhlewan in her ji dijmin narevê
Xwîndirij û serbilind e şer dikî roj û şevê
Ew li ser sînor û şaxa yek demê ranakevê

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Hilkişîn ser goh û şaxa tev li hev daxin hewar
Hin ji bo halan û cengê hin bikin sed kar û bar
Gurz û gaza rahejînin raserî pozê neyar
Dakevin deşt û beyara sed hezar û sed hezar

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Şûr ji kalana derînin top û tenga bidne pêş

Ser ji gewda hilfirînin cendeka hûn bikne kêş
Çar kenara bikne êrîş guh nedin talan û êş
Kurd neda dijmin ti cara xerc û ba çû terx û bêş

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Restem û Guhderz û Kawe hê ji Kurd winda nebûn
Merdê ku rabûn ji Kurdan hîn li cîhan ranebûn
Şûrkişên û nijdevan û xwendevan û zane bûn
Ber berê cîhan tevî bûn ew bi nav û xane bûn

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Av bidin çola bi xwînê her bi ser dijmin bi kîn
Kulm û penca hûn li wa xin wek pilingê devbixwîn
Bidne ser komê neyara laş hemû bikne birîn
Şûr û alên vî welatî raserî şaxan biçîn

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Tevde rabin hey gelê Kurd hûn tevî mêr û jina
Hûn bisojin her firok û top û teng û dijmina
Ev dem û çax tu bizane bûye çaxê hasina
Tû neke qencî bi dijmin kin bikin her gazina

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Rabe cîhan hilweşîne herne cengê lek bi lek
Dest bidin her hêzgirana herne ser çerxa felek
Hûn li hawîrê welatan bibne govend û xelek
Çê ke rûbaran ji xwînê Kurd hemû rahişte çek
Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera
Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera

Tirs ji bo navê me şerm e em hemû Kurd in bi nav

Sor û Lor û Zaz û Kurmanc ber bi hev tên gav bi gav

Bikne gorî xwîn û canan bo welat û qad û av

Her bijî Kurd û kurdistan li her dem û çax û gav

Şer dixwazin xwîndirêjin ceng divên ew sersera

Derdixin çavên neyaran tûj diçin ser her dera.

***

## Divê Kurd hemû cengê bikin

Merd û çelengê Kurd werin em dê bikin doza welat
Mîna gelê cîhan hemî em dê bikin kar û xebat
Ji bo bibin em serfiraz di warê Kurd bikin şewat
Kesê bibêjî Kurd ez im divê bijîn ew serbilind
Divê netirs in her deman ji kuştin û derd û kewat

Raser çiya yê nişteman herdem ji êrîşa mij in
Çi qehremanê Kurd hebin bijîn bijîn bijîn bijîn

Gava dibînim vî gelî xweş wî dinasim Arî ye
Gava diçim axa welat dibînim wê îranî ye
Kî hemberê Kurdan dijî ber bê ez im ka ew kî ye?
Ev serxwebûna vî gelî berya hezar salan hebû
Çawa hebû îro heye wê her hebî bê dawî ye

Raser çiya yê nişteman herdem ji êrîşa mij in
Çi qehremanê Kurd hebin bijîn bijîn bijîn bijîn

Ne kawe û Restem tenê ji Kurd hene her qehreman
Hûr û girê Kurdan dibin zora neyaran her nema
Ger tu nekî bawer bipirs ji goh û deşt û her çeman
Tirs û derew bona çine Kurd her ji wa bûne cuda
Pesn û dirûdê rind û baş pir ji kevin her pê re man

Raser çiya yê nişteman herdem ji êrîşa mij in
Çi qehremanê Kurd hebin bijîn bijîn bijîn bijîn

***

## Kurd bûne wek şêrê birîndar

Kurd in şêrê birîndar
Ji êşa bûne jîndar
Ev xortê wek sipîndar
Li Kurdistan evîndar
Di şer de bûne hîndar
Hêvî heye ji hêzdan
        Dijmin têxin binê dar

Kurd in Kurdê   gernas in
Tena derpî'w kiras in
Serqot û hem pêxwas in
Hawîr cîhanê nas in
Sînorvanê Qewqas in
Ger ew destê hev bigrin
        Xweş polat û elmas in

Kurdo gelkî serhişk e
Naxwî nan û nivişk e
Divê nanê qulmişk e

Ta wê roja ji nişk e
Hawîrê Kurdistanê
    Dijmin jê rakî giş ke

Çêbû cenga Îranê
Dijmin ket faqe faqê
Nalîn û şaqe baqê
Nekin tirs û meraqê
Ji lêdan û felaqê
Mizgîn Barzanî rabû
    Cîhan kirye qelaqê

Çêbû cenga Eylûnê
Dijmin va tê pevçûnê
Nema Kurd karî rûnê
Dest bavêjin qepsûnê
Qut bû çaxê hêrûnê
Heta çil salê dî jî
    Tê birjênî vê xûnê

Wî seydayê Barzanî

Ala şer hilda banî
Go Kurdistan im kanî
Dijmin qîma xwe nanî
Xwîn bû rûbar û kanî
Saya serê pêşmerge
    Îraq bû Kurdistanî

Piştî dora Zaxros e
Carek dora Toros e
Xwedyê şal û kolos e
Bakin li dijmin los e
Wekî kosa ber kosa
Dava deynin ber dijmin
    Wî derxin tev palos e

Herne serê kendala
Rajin gurz û mertala
Ciwan tev pîr û kala
Nema goh bidne mala
Xebata xwey sed sala
Bi avê de neberdin

Gelî qîz û rewala

Ji Tirkî ta bi Îran
Rakin halan û qîran
Li Wan û Mûş û Pîran
Hozan û merd û çîran
Rahêjin şûr û tîran
Cejn û Nûroja deynin
Bi govend bi seyran

Em dê biçin Kurdistan
Bo av û bax û bustan
Werz û rez û gulistan
Çaxê bibî zivistan
Da em herin dibistan
Kû bû havîn û payîz
Rûnim jêrî 'ervistan.

***

## Divê Kurd guhdar bin

Hey Kurdê cîhan guhdar be ev dem
Hişyar bû niha çiya çol û çem
Kete destê Kurd dezgîn û hem gem
Tevan xwe rakir dibûn em in em

Welatê Îraq va bûye tevger
Dijmin li ber Kurd rabûye hember
Barzan û Soran tev bûne leşker
Nav Gor û Behdîn hawîr bûye şer

Îro li Îraq bû roja reş e
Xort û merdê Kurd dikin şoreş e
Barzanî leşker kir qol û beş e
Li jêr û jor û nîv û bareş e

Ji Zaxo bighê sînorê Îran
Kurd bûne ref ref didin hev qîran
Pişta hev girtin xortan û pîran
Dan pey Barzanî hozan û çîran

Ser çiyayê Kurd bû berf û bandev
Kurd û dijmin va diçin ber bi hev
Didin hev qîran bi roj û bi şev
Kurd dikin êrîş dijmin dikin rev

Leşkerê Barzan leheng û zor e
Birek ji Kurmanc birek ji Gor e
Dirjênin îro ew xwîna sor e
Bi hêrz û sehw in rêzan û tor e

Ew dê ji Mûsil dijmin derînin
Şehirzor û zab bi ser de bînin
Kerkûk û Hewlêr nû vegerînin
Bi Xaniqîn de alan biçikînin

Li ser Kurdistan pêtî di dar in
Mêr dikin cengê jin kar û bar in
Em dê her bêjin ta em dikarin
Her bijîn leşker ew şêrê har in.

***

# Çavên welat li pêşmerge ye

Pêşmerge em cengawer in çavên welat her li me ye
Ceng û mirin kêfa me ye navê me lew pêşmerge ye
Mewdan û can talan dikin halan û şer karê me ye
Tirsa me nîne der cîhan kî hemberê sînga me ye
Em narevin em narevin rev bo me Kurdan sosret e

Pêşmerge pişta welat xwîna me germ in her bi wan
Sed aferîn bo vî refî kom bûn li hev xort û ciwan
Heyran bibim bo Mustefa sîng da neyar berya ewan
Wek Restemî cengawer e deng daye wek nûşêrewan
Em narevin em narevin rev bo me Kurdan sosret e

Ev xap û fen pîlan û ger bona neyaran ked nekir
Behrûd û teng û qembere top û tifing û balefir
Pêşmerge em anî bilind kengî neyar zora me bir
Şerm nîne bo me ger bikin difrê bi tiştê ku me kir
Em narevin em narevin rev bo me Kurdan sosret e

Em hûr û gir bendê we ne şêrê welat sed aferîn

Vî dijminê zor û nebaş yek car ji Kurdistan derîn

Lewra ku dilxwazê me ne Rûs û Emêrkan û Pekîn

Van dewleta hîn yekdemê dilsadekes wek me ne dîn

Em narevin em narevin rev bo me Kurdan sosret e.

***

# Kurd hilkişîne ser çiya

Merdê Kurd qol bi qol hilkişîne ser çiya
Roj û şev bûn qelawis li ber serdev riya
Dûr dixin ew em ji hev mal û bav û diya
Da neçî nêv welat ew dijminê wek ziya

Em bi şev ranakevin zû dijmin dakevin
Em narevin narevin narevin narevin

Ê divên dilxweşî ew herne cem Mustefa
Vaye leşker giha hev ew bi kom û refa
Wek pilinga ketin şax û ketin berqefa
Gumguma top û tengan dimdima ser defa

Em bi şev ranakevin zû dijmin dakevin
Em narevin narevin narevin narevin
Va hewar e hin bi hin bo te tê hay welat
Dakû Hemrîn û Zaxros bibine rex Ferat

Pir divê em her bikin doz û ceng û şewat

Wê demê em dikarin bikin kar û xebat

Em bi şev ranakevin zû dijmin dakevin

Em narevin narevin narevin narevin

Ê bivê Kurd bibî serbilind de herne pêş

Ceng û şer pir bikin da ku herin derd û êş

Sîng bidin dijminan û cendekan bike kêş

Ber neyar zanibî çû ew dema terx û bêş

Em bi şev ranakevin zû dijmin dakevin

Em narevin narevin narevin narevin.

***

## Li cenga Zaxo binerin

Hey kurdo meyzîne îro Zaxo ceng e
Dijmin hatin Zaxo tevlî top û teng e
Axa hawîr Zaxo bû rengê pereng e
Pêşmerge hatin şer wek şêr û piling e
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Dengê cenga Zaxo çû hawîr cîhanê
Dengê topê Zaxo da tirk û Îranê
Pêşmerge hatin şer mîna tên dîlanê
Nalîna top û teng ket şûna lîlanê
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Ava cokê Zaxo tev bû sor û xwîn e
Xwîna Kurd û dijmin da nîvê potîn e
Pir hatin biriştin ew guldarê şîn e
Asîmanê ser Zaxo tev ar û pêtî ne
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Hêzê Kurd û dijmin hawîr Zaxo pêl in
Xan û manê Zaxo tev toz û dûkêl in
Pêşmerge her Zaxo bo dijmin nahêlin
Nav Îs û pêşmerge her têl û bêtêl in
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Hîn em hêvîdar in pêşmerge serdest in
Serdarê Îraqê Kurdê pîs tev xwestin
Bertîlxwar û bizdok serxwar û dilmest in
Wan soz û peymanek bo Barzanî best in
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Hêz û komê Be'sî bêbext û bêkêr in
Ev rojê pêşîne hê hinkî ew têr in
Bo zarokê Kurdan rengê şûr û kêr in
Lê hêzê Kurdistan tev Kurd û camêr in
Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e

Pêşmerge pir heyfin ber Zaxo bê berdan

Wê dijmin çibkin jê bê kar û bê serdan

Wê dijmin her bimrî tevlî dax û derdan

Kengî karê rûnê nêzîkî van gerdan

Wey Zaxo wey Zaxo Zaxo bû Berlîn e.

***

## Cenga Kurdê Îraqê

Cengek li Îraqê heye dijmin gelek lê digerin
Rûs û Emerkan û cîhan tev bi dizî lê digerin

Zaxo heta cem Xaneqîn tev bûye halan û hewar
Tev mane bê lîs û guher dalinde û berx û dewar

Ev ceng ji cenga meztir e cenga dilê Asya ye ew
Hê ceng wekî wê çê nebû kî bêjî her nabî derew

Cîhan hemî guhdar dibin ev tiştekî pir mezin e
Kûr û dirêj û sosret e pir şax û pax û bê bin e

Bager li Kurdistan dixin ancê bilind anîne xwar
Mêgan li asmanan xir e sotin çiya talan û dar

Soxoyî bumba dadixin çol û çiya tev bûne toz
Napalima tev kirne hişk bax û Buhişt û mêrg û koz

Van top û teng û zirxiyan sed sed li pey qûna hev in
Êrîş dikin pêşmergeyan ew pêhlewan her narevin

Kerkûk û Hewlêr dojeh in hawîr ewan her gumgum e
Nêzî Suleymanî şer e top û firokan xumxum e

Ew leşker û hêzê giran ev top û teng û balafir
Karê ewan tevde çi ye bo çî dikin ew xirecir?!

Dijmin seraser bû çeper tirsa ewan ku bêne xwar
Zanin ku çaxê dakevin hew guh didin hêzê neyar

Şêrê çiya nû radibin hê nû dixwînin qebqebî
Dijmin heger ew daketin ax û xwelî li warê te bî

Pêşmerge hê nû hingirîn balafira nû dadixin
Sed sed li quntarê çiya laşê neyaran radixin

Dijmin li Kurdê  bê guneh zordestiya gelkî dikin

Lê wê bi vî karê wilo ev bê zirav îdî çi kin

Qîzên wekî Leyla gelek kuştin bi van bumbê giran
Zarok û pîr û pîrebî deh deh dibin axê de man

Wan KelehDîza pir ciwan gund û şehr wêran kirin
Pir bûne sêwî bûne bî malê me pir dêran kirin

Sed heyf li te hey dijmino pêşmerge her amade ne
Gundê me bes wêran bikin zarok û pîr û bende ne

Ev sêzde sal tu şer dikî hey dijmino ma qey nebes
Îdî bes e îdî bes eberya tu bêjî ez nekes

Îsa Siwar çaxê te hat dakev şihar û bergeha
Zaxo bişo hey navgiran îro ji van hirç û seha

Hey şêrgelê sîrwan û tûz Dokan û Balik Beytewat
Ruzgar û Hewlêr û Sefîn Hemrîn û Zozik hem Xebat

Îdî ji dil cengê bikin dijmin bikin serxûş û gêj
Agir nekin sar û sivik canê neyaran her bipêj

Cîhan heger tev bêne şer pişta we her Barzanî ye
Saya serê wî şêrgelî nava we her arzanî ye

Em tev bi heyrana we bin em tev li pey pêşmerge ne
Hûn tevlî Barzanî bijîn saya serê wan em hene.

***

# Kurdê mêr kêla neyar e

Paşmêrê Kurd her dem ez im
Sînga min e kêla neyar
Ger sed hezar kom bêne kurd
Wek pêhlewan dê bêm hewar
Balafiran zû dadixim
Ez hûr dikim topa li xwar
Pey kuştinê şûna ewan
Ser top û tenga têm siwar
Deşt û çiyayê Kurd hemî
Îro ji cengê bûne xwîn

Ev bû hezar salê welat
Hîn şer dikir tîr û kevan
Her tê birîn nû şîn dibî
Ev lawê Zalê qehreman
Gazin ji Kurdan kes nekin
Hember mene sed perleman

Lewra ku Barzan daniye

Yan Kurdistan yan neman

Ez hew dizanim tirs çi ye?!

Piştî seraser bûm birîn

Çep zîvirî çerxa felek

Lewra ku Kurd ma bê qiran

Hîn Qibt û Somer ku nebûn

Bo Kurd hebû navê giran

Em pir dilovan û xweş in

Dijmin di Kurdan bir diran

Kurd bûne şêrê devbixwîn

Hew guh didin bav û biran

Wek wî demê Kurd nas nekir

Dijmin li wa rabû bi kîn

Mizgîn didim ez vê demê

Arî ji bo axa welat

Saya serê Kurdê niha

Cîhan dizanî vaye hat
Xwîna ,im î sor û biha
Arzan didim bona xebat
Nava me rengê dojeh e
Ez dê neyar têxim şewat
Em bûne evîndarê welat
Em bûne Mem ew bûye Zîn.

***

## Hestiraneke evînî

**Gidî hişê min çû nema zanim**

Gidî hişê mi çû nema zanim Çilo çêkim
Birîna laşê mi axiftin gelo dîsa Çi ez lêkim?
Lo şêrîno ma tu divê ser û destê Xwe nû jêkim
Ezê berdim bi avê de evî canî Di pêlê kim

Ez rebena Xwedê kirim ez peritîm hewar. Di vê arê
Bi te zarî tirha reza ji mi bêhtir Tu dildarî

Tu şêrînê dil û canê min î kuro Tu bê bextî
Wekî şêrê girêdayî şev û rojê Li ser textî
Bo kuştina mi wêranê gidî Xwedî Şûr û rextî
Bi wî zarê xwe yî şêrîn bo mi tenê Çima sextî

Herê bi heyrana serê te bim zanim ku tu Bi min karî
Bi te zanim tirha reza ji min bêhtir Tu dildarî

Roja ku ez te nebînim nema karim      Ji nû razim
Ji cîhanê tevî ji dîtina te nazikî pêve     Ez naxwazim
Ku çav li ser bejna te kim j'nû dibim sivik   Wekî baz im
Ji ber derd û kula neyê şaz im pir dijenim Bi awaz im

Neyên serê keskî derd û kulê mi rebenê      Bi hejarî
Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir               Tu dildarî

Erê, emê destê hevdû bigrin herin           Bi çola de
Emê rûnên li ser çiya di ber siya talan       Û kola de
Emê mehra xwe girêdin bi lez  di her dîn   Û di ola de
Emê razên li ser axê vexwin avê              Di sola de

Cihê ez û tu lê rûnên nadim bi Buhiştê       Fireh warî
Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir              Tu dildarî

Kuro malwêrano mane tu jî zanî derdê       Dilketinê
Ger tu nebî kengî bi dûv xwe xim navê      Revandinê
Kulam ev e em bibînin hevdû gavek tenê Pêş mirinê

Tu bersiva dostê dila hê mi nedî        Wey li minê

Lo lo dilo ji ber wilo tu bê kêfî        Tu ser xwarî
Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir        Tu dildarî

Dil û canê mi bigorî te bin çima îro        Te nabînim
Şev û rojê ji nedîna te delalê        Bi evîn im
Wekî kundê serşikêra  hûrik hûrik        Di nalîn im
Van ronikê çavên belek ji nav xwînê        Di palîn im

Nema ez nasdikim dema xewnê niha yarê  Ji hişyarî
Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir        Tu dildarî

Çima hewqa ez badikim dikim nakim dilo Tu deynakî
Bi yek carê bi wî zarê xweyî hinguv        Tu banakî
Dil û hinavê mi hatin xwarê tu dermanê    Xwe lênakî
Ji van qîr û hewarê min mirî bi wê        Serî rakî

Heger jîna mi hîn mabî ezê çilo bikim        Bi vî karî

Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir Tu dildarî

Lo şêrînê mino ger tu neyê sondê dixwim Va ez mirim
Ez bûm xwelî ji vir û pêde nema karim Xwe nû bigrim
Ezê ji ber xwe hatiba cem te lê ne çûk im Ku bifirim
Firotina te çênabî ji dikan û di hezara Te bikirim

Ez keçikim bi fihêt im gerek tu bê Bi hewarî
Bi te zanim tirha reza ji te bêhtir Tu dildarî

***

# Hawê bêlûtê û cengê

Hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo lo lo ev çi şer e

Ev çi şer e çi halan e

Ev çi yexme çi talan e

Leşker li kaş û palan e

Şûr derxistî ji kalan e

Hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo lo lo ev çi şer e

Nû l' Îraqê j' xwe'r bigerin

Kurd û dijmin li hev digerin

B' top û tenga j' hev nagerin

Tevde rabin da em her in

Hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo lo lo ev çi şer e

Xortê Kurdan kar û bar in
Hawîr welat car kenar in
Li wan hawîr ber dibar in
Dijmin bi wan hew dikarin

Hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo lo lo ev çi şer e

Xortê Kurdan tev bûne lek
Ji mil da naxînin ew çek
Şev û rojê ew dikne yek
Dijmin dane ber pêl û şek

Hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo lo lo ev çi şer e

Merdê Kurdan tev bûne gêş

Barzanî wek şêr daye pêş
Çol û diyaran dikne rêş
Her yek cihkî l' xwe dikne bêş

Hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo lo lo ev çi şer e

Leşker xwîna sor dirêjin
Agir goştê laş dibrêjin
Dê zarokê xwe davêjî
Dijmin hê nû wê çi bêjî

Hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo lo lo ev çi şer e

Dor Kerkûk û Hewlêr ceng e
Dor Zaxo qîrîn û deng e
Li vî welatê reng- reng e
Gurmîna firok û teng e

Hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo lo lo ev çi şer e

Hîmê cengê Barzanî ne

Ê dî Kurmanc û Sorî ne

Hin Tirkî ne, Îranî ne

Hin Sûrî, hin cîhanî ne

Hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo lo lo ev çi şer e

Ferman tê j' alî Barzanî

Xwînê nerjînin Erzanî

Berka bavêjin serkanî

Hêvîkin arî j' Hêzanî

***

# Hestiraneke cengî

### Şerê çiyayê Kurdistanê

Herê me dî berê çiyayê Kurdistanê
bi moran û xir û cir e
Çend girgirê bi kumê kolos şal û şapik
rûniştîne li pala gir e
bi dorbînê li ber çava hûrik hûrik dimeyzandin
li Başûr û li Bakur e
Gava dîtin çol û çiya ji dijmina dagirtî ye
Tev hilkişîn seda seda ew der hemî bûn naxir e
Xwedê Kurdan biparêzî yabo gidî
Ji van bêxwediyê top û ber û balafira
Hewar hewar hewar hewar hewar hewar
kurdo were
Mala bavê te ava bî dijmin
hatin ji hawîr ve ser û ber e
ji gumguma balafira ji xumxuma
van xopanê tên zirxiya

Pîr û keçê Kurdan sivik gundê xwe berdabûn
Ketne serê wan çiyakê hemî lat û nav deviya
Kumandarê Kurdan hatin yek yek gerîn
Li ser bav û keç û kal û bira
Digo: Tiştê em dixwazin îro ji we
Îro avê bidin wan rebenê jar û tiya
Emê canê xwe gorî kin gelî yextiyara
Ji bo Kurdê  Kurdistanê li her war û ciya

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar
kurdo were
Mala bavê te ava bî dijmin
hatin ji hawîr ve ser û ber e

Kurda pey de qasid şandin cem leşkerê
Komê wan bê bav û bê ewleyê wan dijmina
Gotin: Gelî leşker em bira ne em du gel in
Nekin bi ya sitemkar û dilkevirê van mezina
Şerê Kurdan nekin gidî ji bo Xwedê

Şîret bikin bi qenciyê îro hin li hina
Bere hûn zanibin tirsa Kurdan nîne bira
Ji leşker û cengawerê nijdeharê mîrê cina
Meyzê hûn guneh in bere pey we bî nemînin
Ew pepûkê bûk û jin û dilketî û dergistiya

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar
kurdo were
Mala bavê te ava bî dijmin
hatin ji hawîr ve ser û ber e

Dijmin digo: Hûn zanibin em hatine gelê Kurda
Winda bikin nav û dengê ola Kurd û Kurdistanê
Emê agir berdin çiyayê Kurdan çi hişt û ter
Ji çar kenara winda bikin hûr û gira ji cîhanê
Emê jin û mêrê Kurdan bidin ber pêsira top û tanga
Gund û şehr û cihê Kurdan tevî burc û xanî
bidin ber nîşanê
Emê bikin ku Kurdistan hew bê gotin

Di rûpelan di nivişta di rapora li Îranê
Emê hingî bikin kêfa li van çol û van beyara
Li nav baxa gulistana bi govend û bi dîlana

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar
kurdo were
Mala bavê te ava bî dijmin
hatin ji hawîr ve ser û ber e

Kumendarê Kurdan digo: Gelî Kurdan min da destûr
Wekî tavê berf û teyrok û baranê beran bixuşînin
Top û teng û balafira tev zirxiya nêzîk bikin
Bi ser xwe de wekî merd û pêhlewana bikişînin
Bi qumbera bi bazoka bi tifinga seda seda
Perçe bikin hûr hûr bikin wekî tozê hilweşînin
Wekî pelê dara refê çûka serê tîra laşa raxin
Sera jê kin ji cendeka van dijmina biweşînin
Wekî berxê serjêkirî li ser qadê belakirî
Serleşker û kumendara li ser axê bikişînin

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar

kurdo were

Mala bavê te ava bî dijmin

hatin ji hawîr ve ser û ber e

Medî tavê ber ba li hevdû katin

bi xumxum û bi gumgumê

Ji her alî bi zarîn û bi qîrînê bi fizîn û nalînê

Yek yek leşker û top û balafira

ne li jêr û ne li asmana

Ji moranê ji lêdanê ji tozê ji telazê tu nabînin

Deng bûne yek guh diçirin ma diqetin hey lo yabo

Ji gurmîn û ji zarînê ji çeqçeqê ji kalînê

Laşê neyar bi ser hev de ji jorê de wekî gindor

Ji ber çemê ku çêbûne ji xwêdanê ji wê xwînê

Xwedê hingî Ferzen anî ji Kurdan re wekî şêra

Heyf û tola wan şêr û merdên hatin kuştin

xweş dibîne

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar

kurdo were

Mala bavê te ava bî dijmin

hatin ji hawîr ve ser û ber e

şad be Xwedo tirsa Kurdan nîne

îro ji kuştin û ji şewatê

Kurd bûne yek ti dibînî va leşkerek

tê ji vir de yek ciha tê

Lekê Kurdan va daketin ji Karmenşah

ji Şehrezor û Mehabedê

Va yekî dî tê ji Bedlîs û Diyarbekir

Mûş û Wan û hem Xelatê

Va ji Sûrî ji Dêrikê ta Efrînê

ji Rewanê bir û mayî li pey wa tê

Hewar hewar hewar hewar hewar hewar

kurdo were

Mala bavê te ava bî dijmin

hatin ji hawîr ve ser û ber e

Lêxin gelî Kurdan sivik lêxin

Me ji Hêzdan îro bi hêsanî hêvî heye

Kurd bûne yek, di vê hûn şer bikin her vê demê

Wekî şêra lewra îro em dibînin roj û benga we ye

Xwedayê mezin pêxemberê paşê deman bi dilnermî

Raser û çavnêr û rêber û Hêzanê şer û cenga we ye

Her dewleta rast û durist li rast û çep li cîhanê

Ji dil û can û dev, belavoka dost û yar û benda weye

Rêzan e û kumendarê we jî hûn zanibin gelî Kurda

Cengawer û serbilind û qehremanê

wek furişta pir zane ye.

***

# Hey xortê pêşmerge

Hey pêşmergên dilawer
Bi Kurdan bike bawer
Bi şahê qad û xawer
Rengê bahoz û bager
Bake dijmin bê ka wer

Xortên meyî dilovan
Dil bi kul û bi kovan
Rahêjin şûr û çovan
Li nav çiya û govan
Wek camêr û mirovan
Êrîş kin hirç û hovan

Bêje nû em bi pişt in
Te ew kalê me kuştin
Te zar û sêwî hiştin
Em ji kîna te mest in

Hinavê me birişt in

Dijmin zanî hûn mêr in

Zal û piling û şêr in

Lat û çiyan dihêrin

Neyarê we newêrin

Heyv û roja dijmêrin.

***

## Sirûda Batmanê

Werin werin Batmanê　　Her nêrîna Batmanê
Bes tênin hûn ji dijmin　　Ber welat Kurdistanê

Ez çûme Kurdistanê　　Min xwest herim Batmanê
Şêrînê nav giranê　　Da ji dil derxim janê

Min qîzek dî dilovan　　Rû şeng û dil bi kovan
Tevlî wê şengiya xwe　　Bûbû di rengê hovan

Bilind û du kezî bû　　Pêxwaz û cil rizî bû
Rikrik e ji jê tirsa　　Nerîna wê dizî bû

Min go qîzê hevalê　　Gerden zerî şepalê
Ka bibêje ji bo min　　Vê deher û hewalê

Qîzê go hey dilê min　　Kesî ne bir kulê min
Ji cegerê mi rakê　　Xwe bide ber milê min

Bi setem û bi zorê		Tirka ez hiştim sêwî
Batman ji ber me girtin		Hewar e ez bûm rêwî

Dilê me tev bû agir		Ji nişka ve me bakir
Me go va ez ber te me		Canê te min ruha kir

Ezê xwe bikme dojeh		Bela bim li hemû cih
Ezê tirka bisojim		Batman bi min bû ageh

Me go qîzê netirse		Li halê min bipirse
Ez û te yek nijad in		Nijad ne tirk û furs e

Qîzê ji nû didîtim		Ku ez xwende û şît im
Ez kurdekî şiyar im		Ne savak û ne mît im

Ezê Batman aza kim		Ezê te rindê şa kim
Tu ser nixûnî îro		Ezê serê te rakim

Werin werin Batmanê		Herin nêrîna Batmanê

Bistînin hûn ji dijmin Welatê Kurdistanê

Ne derman û ne toz e Derman li ber çi tişt e
Ew hineka dibî ar Ê din dibî Buhişt e

Çêtir ji qozeqer e Burhê wê qozeqer in
Şalûl bi rengê xwe ve Kengî li ber hember in

Retrik û zîv û rêşî Ne bazbend û ne kember
Nagihên şengiya wê Her pê re nabin hember

Ew ne piyan û cam e Piyan li ber dinalî
Nîgar ji we re çêbûn Didin pesnê delal î

Ne nêrgiz û binefş e Pelê wan têne xwarê
Kulîlk ku şax û beybûn Ji ber dikin hewarê

Ew ne hinar û sêv e Ew bi lez têne xwarin
Hinar û sêv çi şeng in Belê paşî ji dor in

Perî û sûrişt dibêjin
Hene hin spehî ne
Lê me wek dilbera te
Hê xweşiktir nedîne

Keçek maqûl û şît e
Xwestin qelen biha ye
Bi xwendin û zanîn
Di nav qenca giha ye

Li cem hov û mirova
Gelkî bi nav û deng e
Ê mehra wê bixwazî
Devê rabî bi ceng e

Heger tu wê dixwazî
Wê bistêne ji dijmin
Bê şer ew nagihê te
Ev e peyva min î kin.

***

## Şîn

## Gundê Nûrşîn li Serhedê

Li Serheda gul weşîn bûn
Ji dara pel werî bûn xwar
Ji bêna wan gula qut bûn
Ji min tew tên hewar û zar

Vemirtin rohnî û pêtî
Li Nûrşînê cihan bû şer
Nema Maşûq dibînin em
Çilo wê dil bimênin geş

Hey Ebdullah du çavên min
Çima îro ji min bar kir
Te ez hiştim di tarê de
Ji cîhanê te dil sar kir

Ji wê mala mezin pir çûn

Mirovên xwende û hêja

Li vê çolê tenê mame

Di rengê serxweş û gêja

Dikim şukrê te sed carî

Xwedanê min te kir ferman

Dikim hêvî li min negre

Kulê dil zû bike derman

(Se'îd) kebaniya Ehmed

Diya (Ebdulxenî) rabe

Here ser merqeda seyda

Xwe bavêje pê û kaba

Bibêje hey bira tev çûn

Kurê min ma tenê bê xal

Bikin hêvî ji sadata

Kurê min her bimênî kal

Li şûna xal û apê xwe
Bimênê ew bi dil pakî
Bibî rohnî di tekyê de
Diya xwey dil bi kul şakî

Diya Ebdillxenî bigrî
Ji te kes gazina nakî
Birayê te çi hêja bûn
Bi wan kes hemberî nakî

Tu tenhaye li (TilMe'rûf)
Xerîbê bêkes û malî
Xwedê Ebdulxenî bo te
Bihêlî sê hezar salî

Ciwan û bê miradî tu
Ji te Ehmed xwe kir winda
Tevî Ebdulxenî mayî
Li TilMe'rûf wekî kunda

Çi salek bê diçî oxir

Yekî nazik ji van merda

Dil û cergê me dibrijin

Me davêjin di nîv derda

Se'îd hey xuha şêxa

Xwedê bêhnek fireh da te

Dilê te her dibî kemer

Ji nû ve ew didî kat e

Dilê te bûye wek hêtûn

Ziwa bûn ji çem û cobar

Xwedê zanî çiqa zaf in

Nikarim wan bikim hijmar

Xwedê ev mal mezin kirye

Kulê dijwar dibînin her

Belê sebrê dikin her dem

Kul û janê xwe nakin der

Tenê ez pir dikim nalîn
Di ber wa de şev û rojê
Kulê min bûn çem û derya
Li min cih bûn wekî dojê

Di piştî Ehmedê Xizna
Ê 'Elaeddîn û Ma'sûm çûn
Dil û ceger me bûn agir
Hemî 'alem gerî zergûn

Di piştî wan li Nûrşînê
Şikestin ew sitûnê dîn
Heta Maşûq li pey wa çû
Hinavê me rijandin xwîn

Xwedanê min li TilMa'rûf
Li Nûrşînê bike qencî
Hilîne tu ji ser wana
Kul û jan û reş û rencî

Tu warê wan bikî pîroz

Tu tekyê wan bikî ava

Buhişta xweş cihê wa bî

Ji te ya Reb dikim lava

Birûsk hatin ji Nûrşînê

Digot yadê werin jorê

Birayê tey mezin çûye

Emê karkin hed û gorê

Heçî mizgeft û xanîgeh

Li pey wî man xir û xalî

Mela û seyda û şêx in

Heçî hat û li ser nalî

Welatê Serhedê rabû

Hemî hatin tewafa wî

Bi tore tên dirawestin

Sitûxwar in li hafa wî

Diya Ebdulxenî zûka
Were va çû birayê te
Vemirtin agir û ocax
Şemal û hem çira yê te

Bira Ebdulxenî xwarzê
Were cem xal û malê xwe
Emê xalê te bispêrin
Cihê bapîr û kalê te

Heya seyda yê Nûrşînê
Ji mala hedret û seyda
Heçî ka xwendin û qencî
Ji alî we bi win peyda

Li ba min çi şêrîn in
Di gel we nayne kiryarî
Belê ez pir bi hêvî me
Bibin guhdar li vî jarî

Ji bona ku nebî minet

Mi navê xwe nekir Xîza

Bese ev nasiya der dil

Ji alê min nekin biza

Ji yadê ez dixwazim hem

Ji koma we min û saxa

Di'ayan pir bikin bo min

Xweda hûn tev kin bo saxa.

***

# Lerzek li nav Kurdan

**li nêzî sînorê Îranê, li Bakurê Kurdistanê çêbû**

Sala heftê û şeş de piştî neh sed bihûrî
Heyva paşî Payîzê dengek hat û dikûrî
Digo çêbûye lerzek li nav Kurdan li dûrî
Li Rohilatê Tirkî ez im reben li Sûrî
Hemî pismam û ap in dilê min pir dizûrî

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Derdê cîhanê tevde her têne Kurdistanê
Çend sal berê li Bîngol hey jarê nav giranê
Her çêbûye hejandin îsal berjorî  Wanê
Gundê Kurdan hejîne li nêzîkî Îranê
Qûnax û mal herivtin mala me çû wêranê

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Bêhtir ji pênc hezaran hatin kuştin di wê de
Pêncî hezar bê xanî mane dibin berfê de
Birîndar pênc hezar in min di bextê Xwedê de
Tev bêkes û xudanin ka wê herin ser kê de
Karê me ev hewar e ma dê çi kin jê pê de

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Hey wax çaxê lerzînê pir çêbû berf û serma
Rabin derxin ji axê dest û lingan û terma
Da yê sax hinkî rûnin li ber ardan û germa
Ew Kurd in em jî kurdin  em hew karin ji şerma
Çaxê nekin em pirsê li qîz û naz û nerma

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Hin rahêjin livîna hin rahêjin beroşa
Hinek rahêjin kona hin rahêjin serpoşa
Bibin bo wan hevala bo xanim û pezdoşa

Zêr û pera bidin hev bibin bo pezfiroşa
Bibin derman û hetwan bo birînê nexoşa

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Bê dewlet in hejar in Kurdê  me bê xwedî ne
Dilê tirka li ser wa gelkî bi qehr û kîn e
Bav û kalê me kuştin dilê me hê birîn e
Elman û Emerîka tiştan ji mer dişîne
Nîvê ji tiştê parsê tirkan ji wan dizîne

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Hey welatê me Kurdan tu pir xwedî neyarî
Felek bêhtir ji her der bi vî cihê me karî
Ji felekê ji dijmin seraser tu b' hawarî
Lê hê jî tu ciwan î kes hew bi te dikarî
Ji destê tirkê tazî j' Parîs û Rûs hejarî

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Kurdê me yê li Bakur bere hûn ji teba bin
Bi wan Kurdê  li xapan hê ta em tevde rabin
Vegerînin welatî bi vê axa xwe şa bin
Mizgîn ji bo we îro emê ne herweha bin
Saya Xwedê û Barzan nêzîk emê xuya bin

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê

Sed û bîst gundê Kurdan li wir hatin herivtin
Mûradiyê  hemî çû hinavê me werivtin
Kulê tirka li Kurdan herî hatin gurivtin
Ciwan û pîr û zarok bi birîna durivtin
Ji serma bûne wek bûz gelek ji wa  berivtin

Gelî Kurdan de rabin da herin serdanê
Nîvê berf û bahozê Erdîş û Çaldêranê.

***

# Şehrê Bîngol hejiya

**(Wax li Bîngol şehrê mêran)**

Wax li Bîngol şehrê mêran
Piştî neh sed bûye wêran
Kurd li ser wê bûne dêran
Vaye Bîngol çû herifî

Va di sala yek û heftê
Ev şehir bû wek şikeftê
Lew dikin vê kefte leftê
Vaye Bîngol çû herifî

Dehê paşî ji Gulanê
Hejiya tu nav giranê
Wey li benga te ciwanê
Vaye Bîngol çû herifî

Gelê Bîngol tevde Kurd e
Bûne winda tev di wir de
Ma gelo sax çûn bi ku de?

Vaye Bîngol çû herifî

Kurd hemû îro dibazin
Qey çilo em nû dirazin
Ma ji kê em bikin gazin
Vaye Bîngol çû herifî

Her felek bo Kurd neyar e
Ser welat herdem hewar e
Canê Kurd her zarezar e
Vaye Bîngol çû herifî

Vê yekê tîr daye canan
Pîr dikî xort û ciwanan
Da girî şah û şivanan
Vaye Bîngol çû herifî

Cerg û dil tev bûne pêtî
Ji kulan rabû fihêtî
Rondikê çavan me rêtî
Vaye Bîngol çû herifî

Cax û eywan bûne bin av
Peyda bû şape û sertav
Tevde bûn winda û bê nav
Vaye Bîngol çû herifî

Ev şehir yekser birîn e
Kes nema tev bûn birîn e
Girgir û qîrîn û şîn e
Vaye Bîngol çû herifî

Xan û mewdan çûne xwarê
Kes nema ku bê hewarê
Kuştî hew têne jimarê
Vaye Bîngol çû herifî

Heyf li xort û mêrê çapik
Heyf li bûk û qîz û nazik
Ax li ser zarokê xavik
Vaye Bîngol çû herifî

Hin dibin axê de lal in

Ê birîndar nalenal in
Sax li ser wan tev dikalin
Vaye Bîngol çû herifî

Hey felek ma bext weha bû
Ev şehir hewqa buha bû
Va te kir ku hew xuya bû
Vaye Bîngol çû herifî

Kurdê Bîngol hûn bizanin
Kurd li ser we tev bi jan in
Lewra em yek laş û can in
Vaye Bîngol çû herifî

Qîz û dayik îro negrîn
Hey keçê şêrîn û hem zîn
Da ji qîra em nebin dîn
Vaye Bîngol çû herifî

Her welatê Kurd weha ye
Cîgehê janê dila ye

Ev ji tevdîra Xweda ye
Vaye Bîngol çû herifî

Ma li Erzingan çi çêbû
Her bi vê derd û kulê bû
Ew ji tevdîra Xwedê bû
Vaye Bîngol çû herifî

Kurd li her der dilbizot in
Ma li Amûdê negotin
Ji me sêsed hate sotin
Vaye Bîngol çû herifî

Kuştiyê Îran û Barzan
Amed û Bîngol û Zazan
Hev tebakin gelî bazan
Vaye Bîngol çû herifî

Her bêtarê me giran in
Bê ser û kar û xudan in
Em li hevdû hew dibakin

Vaye Bîngol çû herifî

Ev şehir pir nav bilind e
Va niha bû warê Kurd e
Laşê Kurdan ma di bin de
Vaye Bîngol çû herifî

Heyf ji bo tirka tu dîlî
Bûk û dijmin bibî xêlî
Tû ji dil naçî tu kêlî
Vaye Bîngol çû herifî

Ma heye Kurd li te rabin
Bi gul û baxê te şa bin
Sax û kuştî tev bira bin
Vaye Bîngol çû herifî

Ev hê jîn bo çi bû peyda
Hey felek her tu ne xeyda
Ger bikim gazinde peyda
Vaye Bîngol çû herifî

Ma çi bêjim lawê Qadî
Neviyê Sobar û Madî
Ev dilê kul nabî şadî
Vaye Bîngol çû herifî

Hey kula min pir tu kûr î
Ji welatê xwe tu dûr î
Ez divêm tu hê bizûrî
Vaye Bîngol çû herifî

Malikê min çarde cot in
Hestiyê laşê mi kot in
Kî bibî her bes e gotin
Vaye Bîngol çû herifî

***

## lerzîna Licê

### sala heftê û pênc di roja Şemî de

Sala heftêw pênc di roja Şemî
Şeşê Hêlûnê serê nûdemî
Nedî qadhejî bi rengê gemî
Tirsê da dil û hinavan hemî

Bi rastî derket tirsa dilê me
Derdek nû çêbû da ser kulê me
Bû barê giran li ser milê me
Agira sotin dar û gulê me

Di çaxê nîro ev lerzek rabû
Çaxê bû êvar nûka xuya bû
Kû lerzîna pir di nîv Kurdan bû
Deng kêşa gotin ev tişt weha bû

Dû alê Amed cîhan pir hejî

Heriftin warê avî û bejî

Bêtara mezin li Hetax rijî

Agir lê bû gur hemî bû rijî

Diwazde gundê wir bûne wêran

Çil hezar gundê wir mane dêran

Neh hezar Kurdê Hetax li der man

Bê war û xanî di çol û german

Hezro û zirik û Dara Hênê

Hew kes diwêrî wana bibênê

Ji wan dirabî dûkê tirênê

Heyfa te Hêlê te rind û şênê

Sê hezar kuştî ketin bin axa

Birîndarê pir mîna kelaxa

Hawîr bela bûn li goh û şaxa

Ev in derdê Kurd her dem û çaxa

Gava min bihîst dil dibû agir
Hêrzek hate min ji lew min bakir
Li Qamişlokê min berda Bakur
Min gotin ev peyv hinkî dil şakir

Hey hevalên Kurd kom bin li yek şax
Bi qîr û hawar bibêjin hey wax
Bajarê (Licê) bajarê (Hetax)
Bajarê Kurdan va bûye bin ax

Hey wax û hey wax heyf û mixabîn
Dilê Kurdistan hemû bû birîn
Bû qîr û hawar nalîn û girîn
Hêja ye em Kurd hawîr bikin şîn

Em tevde zanin Hetax hejar bû
Nîşana cenga mêrê Kurdan bû
Li wir Îmalî Şêx Se'îd rabû
Di nîv Kurdistan gelkî xuya bû

Hey wax û hey wax rabin hewara
Zû derxin laşê dibin dîwara
Zû bikin derman wan birîndara
Bibin ber ava ber sîkê dara

Heyfa wan Kurdan heyfa wan mêra
Heyfa wan xorta heyfa wan şêra
Heyfa zarokê rengê sitêra
Heyfa wan qîza wan serbizêra

Çavên min birjê ka burc û xanî
Ka cax û eywan pacê li banî
Ka bax û bustan çiya û kanî
Gelo çi çêbû kî pê dizanî?

Ma emê çibkin em ji hev dûr in
Hûn xweş bizanin em pir dizûr in
Mala mi wêran zêçê we hûr in
Heta em sax in em dê bikûr in

Hey Kurdê  (Amed) em tev bira ne
Derdê me Kurdan her dem wiha ne
Ji alî dijmin yan ji Xweda ne
Di vî tiştî de hûn ê çara ne

Yek ji wan (Varto) yek jê Erzingan
Yek jê Çebexçûr tev bûne wêran
Ê çara hûn in hey Kurdê  Pîran
Kuştiyê dijmin werên in bîran

Hey Kurdê  (Hetax) hûn tev bizanin
Di îro em Kurd tev dilgiran in
Em jî di gel we yek xwîn û can in
Lê em nikarin li hev bibanin

Di nîv me Kurdan sê-çar sînor in
Bêhtinê Kurdan nezan û kor in
Dijminê Kurdan neyar in zor in
Ji xwîna Kurdan rihê wan sor in

Ka dewleta Kurd wê kî xwedî bî

We derdê Kurdan bi kê bi cî bî

Wê kî xwedîkî kesê sêwî bî

Wê kî bikî têr kesê birçî bî

Wê kî di cih de wir bikî ava

Wê kî bibêjî li ser du çava

Kî dila xweşkî bi lave lava

Ka ew kesê baş ew kurê bava

Ka yê bi qencî cilkê li wakî

Ka ew textorê ji dil dermankî

Ka ew serdarê bi lez fermankî

Ev tê serê me ji bo şivankî

Em çawa çêkin em tar û mar in

Em ji bo hevdû tiştek nikarin

Hûn çûne Îran hûn bê hawar in

Ê pir ji Kurdan gelkî sersar in

Hûn jî tebabin bi Kurdê  Barzan
Bi yê Erarat, Dersim û Xerzan
Bi yê Şêx Se'îd ewê bi arzan
Xwîna xwe berdan şikeft û derzan

Herçî ne mir bî serê we sax bî
Ew cihê wêran kanî û bax bî
Her xaniyê Kurd kursî û cax bî
Dilê neyaran her dem bi dax bî

Bi şewqa Hêzdan canê we xweş bî
Ji beybûn û gul gora wan geş bî
Di roja paşî rewan û beş bî
Ne wek vê gavê bextê wan reş bî

Ma heye carek çêbî Kurdistan
Li wan ava kin em nû goristan
Bi zarê kurdî çêkin tîpistan
Em wî welatî bikin gulistan

Em hingî berdin tirk û neyara

Em hew rahêjin bêran û bara

Em xweş xwedî kin Kurd û hejara

Em rengê Zerdeşt şîn bikin dara

Herbijî (Hetax) bijîn Kurdê  wê

Em dê li (Hetax) çê bikin zêwê

Bijîn mêr û jin, xort û keçê wê

Bibim hevparê kêf û reşê wê.

***

## Buhiştek bû dojeh
## (Min Buhiştek dî)

Min Buhiştek dî di wê de ez bi azadî dijîm
Tev gul û nêrgiz û beybûn av talan û giya
Saz li ber qîza dinalin bilbila pir lê dixwend
Min dixwend û ez dirazam li binê dar û siya

Ev welatê min demek dî ku hemû bax û rez in
Bo çi îro bûye tarî lê dirûnin pîrhevok
Min li vir dîlan û şadî bi du çavên xwe didî
Pir di govendê xuya bûn zerî û rind û gilok

Ma gelo tev çûn bi ku de bo çi hew kêfê dikin?
Wekî bûka ku di cih de marekî pîs pêvedî
Bûne mêvanê çi malê hey felek dil peritî
Wê dema ez çûm bibînim dilberê lê min nedî

Ev dîlana hingeding çawa di cih de bû bela

Bûk û zava dest hejandin va ji hevdû bûne dûr
Kes nizanî dê çibûye xêliyê wan tev girîn
Xişr û xalê xwe hilanîn reş girêdan girs û hûr

Va li şûna merd û şêra rovî û hirç û gur in
Xanûman tev bûne wêran lê dixwînin kund û bûm
Min di rabûnê nedîbû sosreta wek vê mezin
Ne dema tirk û Mixûla ne demê Îran û Rûm

Kû niha ez lê dinêrim warekî pir ne xweş e
Ew çem û Zabê di wir de tev didin bêhna genî
Hin kes in malê di wir de rûreş û nû xelek in
Kes di wir de hew dipeyvin ku bibêjin ezbenî

Dijmin in cîhan nenas in tev qirêj û çepel in
Tev diranbeş û gemar in, lêv sitûr û hirç û hov
Ol û bawer her ti nîne ew mirova zû dixwin
Ev welatê ring û paqij kirne ting û peyn û gov

Min li wî baxî didîtin sedseda pêşmerge bûn
Lê çima îro di wir de çêlkerê bê ewle ne
Ew ji bo Kurdan welat elê çima Kurd çû ji wir
Ê li wir mane dibînin tev xulam û kole ne

Ma gelo xewnek mi dîbû ez niha bûme şiyar?
Yan filîmê sînema bû ez bi şev çûme berê
Yan Buhişta asîman bû periyan şanî mi da
Yan gelo bê rêber im ez hew dinasim wê derê?

Heyv di roja çardeha de ketye bin hewrê giran
Heyf li wê heyva bi tîrêj bo çi îro bûye zîz
Agirê top û tifinga bo çi îro bûye sar
Çavreşê min tu ne xeyde hew bike dilman û bîz

Ka ji ber hewra xwe derxe da li min rohnî bibî
Da bibînim wan sitêra ka wekî pêşî geş in
War û der tev bûne tarî em nema zanin çi kin
Ji dema tu bûye winda şev û rojê me reş in

Ma heye rengê berê ku roj li asman bête der
Ez li ber heyv û sitêra hew bikim çav nêriyê
Dilbera xwe min bidîta, min ji nûve hew dikir
Ne ji bo zîna hevalî ne ji bo rû periyê

Hey hewar e ew gulên sor ji gulistanê weşîn
Ma heye dîsa bibînim gul di wê darê hebin
Ew bihara renge renga ku ji nişka bûye hişk
Ma heye carek bibî şîn sosin û çîçek vebin

Ev neyarê ku weha kir ne tenê cenga me kir
Dewletên bêbext û bawer wan ji xwer kirne heval
Ne tenê derd û 'hewalek hate ser pêşmergeyan
Lê belê hate serê wan sed kul û sê sed 'hewal

Ma çima bextê te nîne bo me Kurdan hey felek
Ma heye carek li cîhan dewletek dostê me bî
Zarezarê Kurd belakî nîv der û komê gelan
Yek wekî Barzanî serbest rêber û hostê me bî

Kî dibî dewlet dizanim jê re tê keys û fesal
Ne ji mêrî ne ji zanîn ne ji pirbûna xwe ye
Bêguman em tevde mêr in zane û têra xwe ne
Lê çikim çerxa cîhanê ne li gor keysa me ye

Kî wekî Barzanî rabû hey felek rastî bibêj
Lê tenê Xanî di çaxê xwe de wek wîna hebû
Zanebûna wî ne kêmî zîrekên Yûnaniye
Lê felek her çep dibûrî wek dilê wî çê nebû

Ger ewî bona me Kurdan dewletek anî cîhan
Ew e yê Zerdeşt dibêjî di hezaran radibî
Ger bi saxî ew nebênî ew e tevdêra Xweda
Her deman cergê me Kurdan bi kulê wî şa dibî

Ev çiya tev sernixûmin çi dema tu bê welat
Rengê Cûdî wê te hildin ser milê xwe hey siwar
Bide mizgîn bê ezê bêm da çiya û deşt û der
Tevde rabin bo te deynin kêf û kewn û kar û bar

Ger çi em tevde şikestin wê dema tu çûye dûr
Lê ji pêşî ta bi paşî hêviya Kurd her tiwî
Ne heval û ne neyarê te dizanin te çi kir
Kes nizanî tu li kûye hem ji bo çi tu çiwî

Her bijî tu sermiyan û şehriyarê vê demê
Ta hebim sax ez li pey te can û dil tev bo te ne
Her heta tu sax bimênî em bi te xurt û geş in
Kurd û pêşmerge bi carek bi te şêrî ewle ne

***